

Netewetî qonaxeke pêwîst e ji bo cîhanîbûnê

Perwerdehiya bi zimanê biyan, mirovan dixê nava hinek aloziyan. Ji ber ku zarok dema diçe malê, an jî dema ji dibistanê derdikeve, bi malîyên xwe re, bi der û cîranên xwe re bi zimanê zikmakî dipeyive, lê li dibistanê bi zimanekî din perwerde dibe. Ev yek dibe sedem ku dubendî di şexsiyeta wî de çêbe, ew kes bi xwe re bikeve nakokiyê.

Rûpel 8-9



- **Dewlet li xortên xwe yên ku dişîne şer xwedî dernakeve.** AYNUR BOZKURT **bi nivîsa xwe ya "Tev jî ji kîsê xwe dişîn"** balê dikişîne ser vê yekê Rûpel 3
- **Berpîrsê Kovara Zanîne Ebdulbaqî Huseynî ji nûnerê me yê Sûriyeyê** HELÎM YUSIV **re peyivî û wiha got: "Pêşketina milletan di rojnamegeriya wan de diyar e"** Rûpel 4-5
- **"Sînemaya şoroşê",** METÎN AKSOY **bi vê sernavê li ser sînemaya Rojhilat radiweste û mînak û derhênerên vê sînemayê destnîşan dike** Rûpel 6
- **NÎHAD GULÊ xebatên wênesaz İnayyat Attar bi sernava "Ji germbûna Efrînê ta Parîsa sar"** nîrxandin Rûpel 16

NAVEROK



10

Enwer: Pexşaneşîrek bo hewram Leyla Zana



12

Hesên Zinar: Destmala bixwîn



13

D.Ş Tizyanî: Ji Şêxê Zirav du kasetên balkêş

Ji Xwendevanan

LI welatê me stêrk li ezmanan bêronî, ava çeman miçiqiy; ji hêwa behna barûdê difûre. Lê îro welatê me bûye stêrka cihanê. Axa me ya pîroz çavkaniya şaristaniyê ji nû ve bû "Welatê rojê". Ba û bahož û bagerên ku ji deşt û zozanan radibin li cihanê hilma mirovahiye vedikin. Li welatê rojê neviyên medan kevokên aştiyê gerila her wekî destpêka mirovahiye, komara mirovahiye ava di-kin. Belê, di 27'ê sermawezê de gaveke girîng ji bo pêkanîna hêvi û daxwazên gelê me û gelên Rohhilata Navîn hatiye avêtin. Ev çejna giranbûha gelê me pîroz be.

AHMED BENEK

HER wekî hûn jî dizanin îsal şerê rizgariya welatê me gihîştîye merhaleyeke nû. Êdî şervanên azadiyê bi çalakîyên întixarî xewên şevan li mêtîngeran diherimînin, ziravên wan diqetînin. Êdî mêtînger wekî ku ji melkemot ditirsin, jî jînen ducanî ditirsin. Her jineke ducanî li ber çavê wan dibe şervanekê azadiyê. Bi nivîsa vê nameyê re careke din dibêjim, hemû pakrewanên azadiyê di nava dilê min de cih girtine. Bi taybetî şehîdên li Zîdana Amedê, Rehşan, Zekiya, Bêrivan û Ronahî û Rewşen, Zilan û Bermal heta roja gerdûnê ya paşî, wê di dilê min û di dilê hemû rizgarxwazên welatê mêtîngeh de bijîn.

GIRÊ DERSILÊ



Gelo çapemenî li xwe werdiqile?

MEHMET GEMSİZ

Li aliyekî gengeşiyên li ser hebûna "gladio" ya tirk û li aliyê din jî nîqaş û gengeşiyên li ser amadehiyên qanûna ji bo çapemeniyê, Tirkiye berî nava hev daye. Hikûmet lê dixebite ku berê rojevê biguhêre. Hebûna kontr-gerîla bincil bike. Lewma zûzûka dest avête xebata qanûna ji bo çapemeniyê. Di vî warî de jî bi ser ket. Çimkî ne tenê li Tirkiyeyê, li derve jî li ser vê mijarê tê xebirdan.

Hikûmeta koalîsyonê sansur datîne ser çapemeniyê. Dixwaze benê wê tam bixe destê xwe. Lê divê neyê jibîrkirin ku, beriya bûyera li Susurlukê, hem Tansu Çiller û hem jî Necmettin Erbakan ji medyayê ne razî bûn.

Erbakan eşkere gotibû ku, ya wê çapemenî di nava sê mehan de xwarî destê wan bibe, ya jî wê pozê wê bê firikandin.

Ji berê ve tê zanîn ku desthilat û çapemenî çiqas ji hev re canêcanê ne. Gava têkiliya di navbera wan de xera dibe, pê re şûrê xwe ji hev re dikîşînin. Sebebê xerabûna têkiliyan jî, parînekirina nîmetên îktidarê ye.

Patronên medyayê yên xurt û desthilat di rastiye de şîrkên hev in. Teşwîk û krediyên ku hikûmet dide patronan em binin

bîra xwe.

Îro ev sariya heyî, ne ji ber xwestina çapemeniyê ya civakeke paqij û demokratîk e. Tu çax medya li vî welatî dilîki azadiyê, demokrasiyê nebûye, ji heyn û heyama Osmaniyan heya a niha tu carî ne bi serê xwe bûye. Her pêgirê îktidarê bûye û ji emr û fermana wê derneketiye.

Digel vê rewşê, di nav çapemeniyê de qelemên xwedan rûmet û şeref jî kême nebûne. Ew kes êdî wekî awerte (îstîsna) têne jimartin.

Sansur jî her hebûye û carinan jî li gorî mercên demê bi eşkerahî xwe daye der. Ev hem bi saya qanûnan pêk hatiye û hem jî medyayê bi xwe otosansur li xwe çespandiye. Ji bo peyitandinê, yanê îspatkirina hema em bala xwe bidine van deh pazdeh salên dawî bes e...

Nemaze, bi pêngava 15'ê Gelawêjê (tebaxê) re rûçikê çapemeniyê tam xuya bû. Rûpoşa wê ket, jixwe wê jî hewce bi veşartina niyeta xwe ya rast nedidît êdî. Ew, ne wekî hêza çaremîn, lê wekî şaxeke Rêxistina Saloxiyê ya Neteweyî (MÎT) ya tirk tevgeriya. Em li vir mamosteyê hêja Îsmail Beşekçi bi bîr bînin ku cara yekemîn wî navê şaxa MÎT'ê li çapemeniyê

tirk danî.

Ha em vê jî bibêjin ku navekî wê ye din jî, çapemeniya mihemedok (mehmet-çîk basin) e. Sicîla wê ne paqij e.

Ew qas rojnamevan hatin kuştin, dergek ji wan derneket, li hembîşeyên (meslekdaşên) xwe xwedî derneketin, li ber çavên wan, di eynî roj û saetê de avahiya Özgür Ülkeyê hate bombekirin, xwe li ker û laliyê danîn, gund û daristan hatin şewitandin, nûçeyek di rûpelên xwe de derne-xistin, di ekranên xwe de pêşkêş nekirin. Bi hezaran mirov li navrojê hatin kuştin, bi awayekî cidî li serê nesekînîn, navê "faîlî - meçhûl cinayet" li wan kirin û hew.

Rewşenbîr, nivîskar, hunermend, siyasetvan, rojnamevan, bi kurtî kesên bihîz-yar gava dengê xwe bilind kirin, li dijî vî şerê kirêt î bêhempa derketin, nivîsîn, peyivîn, strîn, çalakî pêk anîn û hatin girtin, hatin cezakirin, hatin kuştin, çapemeniya tirk çi kir? Li çepikan xîst, ji bo kirin û pîrêzeyên dewletê.

Qîma xwe bi vê jî neanî, hemû kesên dijber (muhalîf) piştevanên PKK'ê îlan kir, bi vê helwesta xwe qetla wan helal kir. Hema her tişt kirin stûyê PKK'ê, topa esmanan jî li yekî bikeve berpîrs PKK ye...

Li Kurdistanê çavkanî û jêderkên nûçeyên wan rayedarên dewletê ne. Ew di xizmeta şerê psîkolojîk de bi dil û can cih digire.

Sûcê vê çapemeniyê pir giran e, xwezî me bawer bikira ku wê bîr bîriye rewşê û bûye azadîxwaz, bûye aşîxwaz, bûye mirov û li hemberî kirêtan têdikoşe.

Namê komara tirk bîn: Çetexane

MEMED DREWŞ

Çar dê meng (aşm) de Susurluk de jû mercedes û kamyona vardiyay pê, riyê dewleto qilêrîn vejya werte.

Mercedes miyan de Serokçaş û Mebûsê DYP Sedat Bucak, Şefê polîsan Hüseyin Kocadağ û polîsandê dinyay hetra geryriyayê la belê hetanî nika nêtepişyaye Abdullah Çatlı û namedê Gonca Us de jû.cenyek vejyê.

Nînan miyan de bê Sedat Bucakî kes nêxelsiyay. Erebe miyan de dabancey, tîfîngî û vengbirnayey vejyay. Nînana piya Çatlı sero jû nasnameya sexte û pasaporta kesk vejyê. Yanê jew mardimo 17 seryo hem Tirkiye de û hem jî dinya de geryeno, ser ro pasaporta kesk vînyena. Na pasaport, bê mardimandê dewlet kesî nêdanyena. Jew nê jî niyê? Dewlet namey de Mehmet Özbay de jû nasname, jew jî ruhsata çek dawa ci.

Ebi nê bûyerê, eşkere biye ki vatişê "dewleta çeteyan" rayşt vejyaya. Ma nêzdiyê 10 seriyo vam, Tirkiye dewleta hiqûqî miqûqî niya. Miyandê 2 aşman de bewnî çend çeteyê dewlet vejyay wertê, ma jew çim çekime, nê di mengandê badoyan.

Çeteyê sôylemezan, Çeteyê Gever, Çeteyê Ağansoy û Çakıcı, Çeteyê Qoser, Çeteyî İzmît.

Çeteyê Enqere, Çeteyê Edene, Nê

Hendayê sûcê Çatlı estê, jew mebûs û şefê polîsana piya geyrenê. Hem jî Sedat Bucako îna ebi nasnameyê rayştina sinas-nena, no hirê seryo ki Çatliya piya xeftiyeno. Eger dewletandê bînan de tevayê wînaynê bibiyayî se, Sedat Bucak nika merdim geyriyayî rê, alîkarî kerdiş ra girotxane de bi.

pêro jî merdim kiştin, zorna perey giroten, qesbkerden, merdiman ramina-yen, karê qaçaxî kerdiş û bîni. Nika jî no çeteyê badoyîn vejyaya, yanê Çeteyê Susurluk.

Nê çetî miyan de nameyê sermayendê dewlet pêro raverdi; Mehmet Ağar, Tansu Çiller, Sedat Bucak, Korkut Eken, İbrahim Şahin, Hüseyin Kocadağ û bîni. Nê pêro mardimê dewletê qandê coya dewlet Mehmet Ağarî ra îstîfayê ci waşt. Êy jî îstîfa kerd, la belê na îstîfakerdiş riyê dewletê rastîn nêşa racano.

Badê 17 rojan Sedat Bucakî Rojnameyê Gözcüya û televizyonê HBB hevpeyvîn kerd. Ebi nê hevpeyvînê sûcê dewletê hîn weşî vejyaya wertê. Bucakî vat: "Ez Abdullah Çatlı nameyê cinê raştîya sînaşnena. Dewlet heveyê wezîfey taybet dawo Çatlı û embazanê ci." Nika ma tiya bewnim Çatlı kamo? Çatlı 1977 de Cageno Serokê ÜGD'ey bi. 1978 de M. Ali Ağca û Oral Çelik ya piya Abdi İpekçi kiştin de namey ci raverd. Versûcê kiştina 7 endamê Partiya Karkerên Tirkiye (TİP) fina Abdullah Çatlı yo. Tirkiye de qandê coya 7 finî îdamê ci wazyayî. 1985 de Fran-

sa de qaçaxîna eroînî ra tepişya, eyşt giroxane. Bado Fransa de cezayê ci qediya, rîşt Swîsre. Wexto ki giroxaneyê Swîsre de bi, Çatlı remna û Tirkiye ard, xo destê xeftina. Badê nê roji nameyê Çatlı miyan de kiştinê azadîwazandê kurdan raverd.

Yanê hendayê sûcê Çatlı estê, jew mebûs û jew şefê polîsana piya geyrenê. Hem jî Sedat Bucako înan ebi nasnameyê rayştina sinas-nena û goreyê vatişê Bucakî, o hirê seryo ki Çatliya piya xeftiyeno.

Nika ma pers kim, teva wênaynî bê dewleta çeteyan cayê beno? Bêguman nêbeno. Eger dewletandê bînan de tevayê wînaynê bibiyayî se, Sedat Bucak nika merdimê geyriyayî rê, alîkarî kerdiş ra girotxane de bi.

Ma tiya dewlet ra pers kem; şima îfadeyê jew îtirafkarî ser A. Melik Fırat hema tepîşt, eyşt zere, şimayê Bucakî çi ra teberê tepşenê?

Dewleta vana jew mardim kurdan het ca megiro, se keno, va bikiro. Heme çî serbesto. Nû wo jî qedayîş û îflaskerdişê îdeolojiya dewletê mûsneno ma. Tayn mind azadîwazanên kurd û tirk nînan ra hesab pers kirê.



HÊZÊN dewletê avêtin ser sazîyên demokratîk. Roja 26'ê sermawezê hin sazîyên demokratîk wekî NÇM, İHD, TUAD, EKB, DMP, Navenda Çandê ya Stranê, Komeleya Dêrsimiyân, Navenda Hunerî ya Stenbolê, Komeleya Pîr Sultan Abdal û Weqfa 68'yan bûn hedefa êrişê hêzên dewletê. Di cerdên polîsan de 8 kes hatin binçavkirin.

Ev êrişên hêzên dewletê bû sedema reaksiyona derdorên demokratîk. Bo nimûne: Rêxistina Stenbolê ya HADEP'ê bi daxuyaniyekê cerdên polîsan şermezar kirin. Di daxuyaniyê de tê gotin ku hikûmet bi kirinên wilha dixwaze rojevê biguherîne da ku hevalmendiya xwe û çeteyan veşêre.



■ Mêj ve dihate gotin ku balafira Orgeneral Eşref Bitlis bi xwe neketiye; lê hatiye xistin, ev yek bi rapora pisporan jî eşkere bû. Pisporên ji Zanîngeha Teknik a Stenbolê (İTÜ) bi raporekê diyar kirin ku bi ihtîmaleke mezin, balafir ji ber sabotajê ketiye. Sedemên ku berê ji bo ketina balafirê dihatin destnîşankirin, di vê raporê de tên pûçkirin. Serokê Partiya Karkeran (İP) Doğu Perinçek bi civîneke çapemeniyê roja 25'ê sermawezê ev rapor da nasîn. Li gorî Perinçek ji ber ku Bitlis li dijî hêza çakûç derketiye, hatiye kuştin. Balafira ku Eşref Bitlis têde bû, roja 17'ê reşemiyê 1993'yan li Enqereyê ketibû.

NÛÇE

Tev jî ji kîsê xwe diçin

Dixuye ku dewlet beriya ku wan bişîne leşkeriyê dikare bi rojan û bi mehan zilm û tahde û îşkenceyê li wan bike (mîna Osman Murat Ülkeyê ku çûyîna leşkeriyê red kiribû), lê piştî ku diçin, wisa dixuye ku tev jî "ji kîsê xwe diçin"!

Ji bo anîna dîlên (esîrên) ku di destê PKK'ê de ne, tu kesî xwe nelivand û tu camêr ji bo vê yekê nehatin dîtin. Berî bi demekê ji aliyê Serokê Konseya Rêveberiya Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKDW) Zübeyir Aydar ve hatibû daxuyakirin ku "wê PKK di 27'ê sermawezê de dîlên di destên xwe de berde, ji ber vê jî bila heyetek were wan bistîne", lê tu bersiv ji vê bangê re nehate dayîn.

Wekî tê zanîn cara yekemîn bi serokatiya Fethullah Erbaş heyetek çûbû başûrê Kurdistanê ji bo ku leşkerên di destê PKK'ê de ne, bîne. Lê di roja dawîn de ji ber hin probleman PKK'ê diyar kir ku "wê leşkeran berne din."

Piştî demekê ji ser vegera heyetê

ya ji Başûr, PKK'ê careke din bangî wê heyetê kir û got: "Bila tevî Erbaş heyet were. Emê di 27'ê sermawezê de dîlên di destê xwe de berdin." Lê belê esîr (dîl) dîsa nehatin berdan. PKK'ê dîsa da xuyakirin, ji ber ku ji aliyê dewleta tirk ve cihên ku esîr lê ne ev 4-5 roj in tene bombekirin û tu ewlehiya esîran nîn e, ew careke din berdana esîran taloq dikin.

Ji bo standina leşkeran ne Fethullah Erbaşê ji RP'ê, ne Segbetullah Seydaoglyê ji ANAP'ê (ku gotibû eger bangî min bikin ezê herim), ne jî camêrekî an jî canikeke hezkiriyê dewleta xwe, xwe livand. Erbaş diyar kir ku, muhleta pasaporta wî xelas bûye, hê nû muhleta pasaporta xwe dirêj kiriye. Ji ber wê jî nekariye here. Erbaş neçûyîna parlementerên



Kesên ku nizanibin dilê dayikan çawa dişewitin li ser zarokên xwe, ne tu xema wan e kî miriye. Heta ku dayik li ber vê yekê nesekin, wisa dixuye ku heta demekê dirêj jî, ev rewş wê bidome.

partiyên din jî bi "tirsonekiyê" ve girêda û got: "Min bangî hemû mebûsan kir. Berî bi çendekê min ji Segbetullah Beg re jî got. Lê wî ji min re got, 'hele ew roj were, emê lê binêrin.' Heta vêga jî tu deng jê derneket. Ev kes di demên din de jî, mîna le-

hengan xwe nîşan didin." Fethullah Erbaş di dawiyê de ev jî anî ziman: "Eger PKK leşkeran berde, ezê herim wan ji Deriyê Xabûrê bigirim."

Ev demekê dirêj e ku dê û bavê hin esîran li Dihokê li hêviya berdana zarokên xwe ne. Di 26'ê Sermawezê de, hin ji wan; diya Tuncay Kavaklıoğlu; Gülsüm Kavaklıoğlu, diya Hakan Pusat; Nuran Pusat, dê û bavê İbrahim Yaylalı; Üner Yaylalı û Yavuz Yaylalı, diya Tevfik Öztürk; Bedriye Öztürk, diya Bektaş Avcı; Zekine Avcı li Dihokê ji çapemeniyê re daxuyaniyek dan. Li gorî vê daxuyaniyê, ev kes li hêviyê ne ku ev bombekirin raweste û zarokên wan jî werin berdan. Lê ji ber vê bombekirinê zehf ditirsin ku tiştek bi zarokên wan were.

Belê... Berî ku herin leşkeriyê, bi birêxistina dewletê, li ser milê nas û hevalên xwe tên gerandin: "Esker wê here, wê vegere!", "Eskerê herî mezin ê me ye!"

Tê dîtin ku dewlet beriya ku wan bişîne leşkeriyê dikare bi rojan û bi mehan zilm û tahde û îşkenceyê li wan bike (mîna Osman Murat Ülkeyê ku çûyîna leşkeriyê red kiribû), lê piştî ku diçin, wisa dixuye ku tev jî "ji kîsê xwe diçin"!

AYNUR BOZKURT



Berî ku herin leşkeriyê, bi birêxistina dewletê, li ser milê nas û hevalên xwe tên gerandin: "Esker wê here, wê vegere!", "Eskerê herî mezin ê me ye!" lê piştî ku diçin, wisa dixuye ku tev jî "ji kîsê xwe diçin".

'Pêşketina miletan

di rojnamegeriya wan de diyar e

Di hejmara me ya 42'yan de me hevpeyvîneke ku bi berpîrsên kovara Pîrsê re kiribû, weşandibû. Her wiha me gotibû ku wê ev hevpeyvîn bi dorê werine weşandin. Em di vê hejmara xwe de îcar cih didine yek ji wan hevpeyvîna ku HELÎM YÛSIV bi Berpîrsê kovara Zanînê Ebdulbaqî Huseynî.

Destpêka rojnamegeriya kurdî li Başûrê Biçûk hetanî roja îro, rûpeleke dûvdîrêj e, gelo çawa diyar dibê?

Destpêka rojnamegeriya kurdî li nik me kurdên Sûriyeyê ji serdema hêja Mîr Celadet Bedirxan û derxistina kovara wî ya navdar Hawarê dest pê dike.

Mîr, di sala 1932'an de dest bi belavkirina kovara Hawarê kir û 57 hejmar jê weşandin. Niha ev kovar bûye lêvegereke baş ji hemû torevan, rojnamevan û pêyamhîneran (nûçevanan) re.

Mîr Celadet 11 salan ligel hemû dijwariyan, kovara xwe berdewam kir, lê mixabin kesên ku bi Mîr re, bi kovarê mijûl dibûn, mîna Osman Sebrî û Cegerxwîn û kesên dîtir, derxistina kovarên din an berdevamkirina kovara Hawarê ji xwe re nekirin kar. Lewma valabûneke mezin ji demê çêbû ku gelê kurd li Sûriyê bêrojname û kovar bimîne.

Li virê em ji bir nekin ku Mîr Celadet piştî kovara Hawarê, kovareke din bi navê Ronahî derxist, hejmarên wê kovarê li dora 28 hejmaran bû. Di navbera van salan de 1942-1945'an de derket.

Dibêjin Mele Hesenê Kurd (Hesen Hîşyar) kovarek bi navê Agahî di sala 1966'an de belav dikir û li dora 19 hejmar jê derxistin. Lê mixabin tu hejmar ji wê kovarê ne xuya ne. Piştî 23 salan ji rawestandina kovara Hawarê, Seydayê Cegerxwîn, di sala 1968'an de dest bi derxistina kovara Gulîstanê kir. Piştî re di sala 1979'an de kovarek bi navê Gelawêj derket meydana û di sala 1983'yan de kovara Stêr ronahî dît. Piştî re ji di sala 1986'an de kovarek bi navê Xunav derçû.

Ev kovarên jorî (Gulîstan, Gelawêj, Stêr û Xunav) tev ên partiyan bûn. Formên wan pir hejar bûn. Her yek çend rûpelên bêçap bûn, naverokên wan jî qels bûn. Ango van kovaran tevan nikaribûn bigihên asta kovara Hawarê di reng û naverokeka xwe de.



Berpîrsê Kovara Zanînê Ebdulbaqî Huseynî

Di adara sala 1989'an de me du xortan (Ez û Selman Ebdo yanê Konê Reş) kovareke biçûk bi rengekî spehî û naverokeke pak derxist. Navê kovarê Gurzek Gul bû. Kovareke folklorîk û çandeyî bû, li dora 12 hejmaran me bi hev re derxistin; hejmara yekê di adara sala 1989'an de derçû

Eger rewşa îro ev rewş be, wê rojnamegeriya me jî li şûndê bimîne. Lê di vê holê de, divêt em kesên ku xwe dikin berpîrsên kovaran, hay ji xwe, ji kovar û rojnameyên xwe hebin. Gerek em bi demê re bin, serwextî bûyerên xwe bin, da ku ev kovar û rojnameyên me ne kêmi yên xelkê bin.

û hejmara 11-12'an ji di meha adara sala 1991'ê de rawestiya.

Piştî veqetandina me her du kesan ji hev, min di tîrmeha 1991'ê de dest bi derxistina kovara nû kir, di gel hevalekî bi navê Ferhadê Çelebî.

Hevalê berê Konê Reş, berdewam kir çend hejmarên din ên kovara Gurzek Gul derxistin û piştî re ew jî rawestiya.

Piştî derketina kovara Zanînê ku bi rengekê xwe yê nûjen belav bû, partiyan kurd

çav lê ketin û xwestin kovarên xwe yê klasik bi pêş bixin, di eynî salê de kovara Gelawêj bi rengekî spehî belav bû. Di pey de tev partiyan, guh dane kovarên xwe û bi rengekî nûjen derxistin. Piştî ku partiyanê Kurdîstana Başûr rîya çapxaneyan şanî wan dan. Û ji bo sozdariyê divêt em

qenciya birayê hêja kek Selah Berwarî ji bir nekin; çimkî wî kesî gelek alîkarî da tev kovarên kurdî ku ronahiyê bibînin û ji qalikên xwe yê kevn derkevin.

Di van çend salên dawîn de, çend kovarên din derketin meydana tore û çanda kurdî, mîna: Roj, Aso, Bihar, Pîrs. Niha kovarên partiyan ên serbixwe ku berdewam in, ev in: Zanîn, Pîrs, Gulîstan, Bihar, Stêr, Gelawêj, Aso, Roj, Xunav û rojnameya Delav. Di nav re carinan hin berhe-

vokên kurdî em dibînin; mîna Babîs Deng...

Ev bû tevgera rojnamegeriya kurdî me. Ez dixwazim şanikeke girîng Gurzek Gul diyar bikim; ew jî ev e: K. teya Gurzek Gul, ji bilî derxistina kovarê bi hin karên din radibû.

Weşandina pirtûkan ji xwe re kiribûnanc û li gorî karîna xwe pirtûkek bi nîşana Dengê Cegerxwîn çap kir.

Lidarxistina şevên toreyî û hembêza na mewanên hêja yên ku mijûl dibûn bû re û çanda kurdî re.

Di navbera 1989-1990'î de çend mînan hêja ji nav kurdên Yekîtiya Sovyeta Berê hatibûn bajarê Qamîşloyê. Kovara Gurzek Gul a pêşîn bûn ku ev mînan hembêz dikirin û bi kar û barên wan mînan bûn. Hinek caran jî şevên ji bo tore û çanda kurdî digel wan kesan li dar xistin. Ji wan kesan ev bûn: Temûr Xelîl Madoy, Şeref Çerkes Eşîriyan, Tosinê Şîed, Eskerê Boyîk, Ordîxanê Celîl.

Danhev û nivîsandina keleporek û zana tîna (folklor) kurdî, armanca herî girîng li bal me.

Komîteyê G.G, gera di nav gund û guhdan li gotinên pîrejin û kalemêra xwe re kiribû kar. Bi rastî wê gera me deyeke baş da, çimkî piştî wê gerê, her roveki ji me pirtûkek ji çîrokên mîran çap kir.

Der barê damezirandin û weşandinê Kovara Zanînê de hûn dikarin hin amûrê bidine me, wekî çend hejmar jê derkevin her yek ji çiqasî derdikeve, rewşa Zanînê bi gelemperî çi ye?!



Zanîn, her wekî hûn dizanin kovara torevanî û çandeyî ye. Kovareke serbixwe aza û dengêkî demokrasî ye. Di tîrmeha sala 1991'ê dest pê kir, bi alîkariya mînan kesan; ez û Ferhadê Çelebî. Damezirandina wê, ne ji ber xwe ve hat meydana, wekî me di pêşgotina hejmara yekê de belav kiribû, kovara Zanîn berdewamiyê ji gelek kovaran re û bi taybetî ji kovara Gurzek Gul re. Çimkî di wê demê de mînan dana xwendevan û nivîskaran ji beyarî pelên Gurzek Gul, firehtir û mezintir bû. Ji ber wî hawî jî, me biryarek da ku bejna wê kovarê firehtir û mezintir bikin.

Kovara Zanîn armancên mezin dibûn ber çavên xwe, lê mixabin "hesabêkê û malê li hev nehat." Me li ser çanda hundir ji hejmara yekê sê navnîşan da xuyanî, ew jî ev bûn:

1) Zanîn, kovareke serbixwe û azadî çî berhemên ku tê de belav dibin ramana nivîskaran in.

2) Zanîn, her du mehan carekê derve xwendevanan hembêz dike.

Ez dixwazim li ser xala duduyan westim: Dema ku me danîbû berçavê x



Kovara Zanîne bi karê derxistina pirtûkan jî rabûye û ta niha heşt heb çap kirine. Li jorê bergên wan tê dîtin. Li milê çepê jî berga kovarê dixuye.

em ji her du mehan carekê kovarê derxin û biweşînin, me xwe ji bîr kiribû ku welatê me nîn e û em nû bi şîr ve bûne. Lê dîsa jî, bi hemû huner û hêza xwe, me dest bi kar kir.

Di sala 1991'ê de, me karîbû sê hejmaran (1,2,3) ji kovarê biweşînin. Di sala 1992'yan de, hîn jî em li ser hêza xwe bûn, me 3 hejmarên din (4,5,6) derxistin. Lê di sala 1993'yan de, em hinekî ji tundiya xwe hatin xwarê, me du hejmar weşandî (7,8). Û her wekî tê nasîn di her du salên dawîn de 2 hejmar tenê derçûne. Di sala 1994'an de hejmara 9. û di 1995'an de jî hejmara 10.

Wekî tê xuyandî derçûna kovarê ne ew qasî serdema xwe bû, ev jî dihêle ku em çend sedeman bibêjin. Sedema yekê ew e ku me lar û barên xwe pir giran kiribûn. Me weşandina pirtûkan (ji weşanên Zanîne) danîbû ber xwe. Erê me li dora 8 pirtûkan belav kir, lê li ser hesabê kovarê di hate çapkirin.

Dîsan jî, em ne poşman in, çimkî hemû berhemên ku me weşandî dikevin coka tore û çanda kurdî. Ji bilî van tevan, alîkarî bi gelek dost û birayan hate kirin, ku em ji wan re bûne rêber, ji bo çapkirin û belavkirina pirtûkan. Bêpayebûn, di nav çend salan de, me bingehê xurt û mezin ji xwendevanan peyda kiribû. Şanika dawî bo kovara Zanîne ev e: Wekî hinek dilsoz dibêjin; kôvarên me bûne wekî heyra li bin ewran. Em karin ji wan dilsozan re bibêjin; nêzik ne dîr, wê hejmara yazdehan têkeve destê xwendevanên me yên hêja...

Astengiyên çapkirinê çi ne?

Bêguman dema em bibêjin astengiyên dijwar tune ne, em wê çaxê xwe dixapînin. Çimkî werisê ku fermandariya Sûriyeyê ji me re sist kiriye, kare û dike, di her saetê de bijidîne. Divê ku em zanibin "Bihar li cem me negihaye çokan." Bi kurtî astengiyên bal me ev in:

1) Dûrbûna cihê çapxaneyê, çimkî em

li Şamê an Beyrûdê çap dikin

2) Karê nehîni û tîrsa derxistinê û xwestina pereyên zêde ji aliyê xwediye çapxaneyê ve

3) Rewşa endamên kovarê û karên wan ên şexsî, ku her kes ji wan ne vale ye ji wî karî tenê re

4) Rewşa aborî ji bo çapkirina her hejmarê, astengiyêke pir mezin e, çimkî mafê çêkirina kovarê ji bêrika endamê wê ye

5) Astengiya belavkirinê û danheva pereyên wê

Rewşa rojnamegeriya kurdî îro hûn çawa dibînin?


Eger rewşa îro ev rewş be, wê rojnamegeriya me jî li şûndê bimîne. Lê di vê holê de, divê em bi xwe, em kesên ku em xwe dikin berpîrsên kovaran, hay ji xwe hebin, hay ji kovar û rojnameyên xwe hebin. Gerek em bi demê re bin, serwextê bûyerên xwe bin, da ku ev kovar û rojnameyên me ne kêmî yên xelkê bin...

Her wiha em dizanin, gelek bingehên derxistina kovar û rojnameyan hene, em bi xwe jê dîr in. Ji bilî van tiştan tevan, gotinek ji bo hemû kovarên me heye, divê em rêza xwendevanên xwe bigirin. Em berhemên çak û bilind şanî wan bidin, divê em rêberê gotina şîrî û paqij bin..

Ji van gotinan tevan tê diyarkirin ku, rewşa rojnamegeriyê ne ew çendî bi dilê me ye. Şanêke di heye; em hêvîdar in ku bi çavekî mezin lê bê nêrîn. Pîrbûna van kovaran û dûrbûna van komîteyan ji hev û din, pir tiştêkî xerab e ku nexweşiya partiyên me kurdan ketiye nav rewşên bîrên me û hiştiye ku dîrî hev bikevin. Ev jî şûneke pir mezin û dijwar di paşxistina rojnamegeriya kurdî de dileyize. Hêviya me ji partiyên û hemû kesên rewşên bîr, ev ên ku têkiliyên wan bi rojnamegeriya kurdî re heye, bi mêjiyekî zelal û paqij li vê meseleyê bimeyîzin. Çimkî tê gotin ku "Pêşketina mîletan, di pêşketina rojnamegeriya wan de diyar e".

Pîrsên bendeyî bersivan

MEDENÎ FERHO



Pîrs 1: Ku mirov pê zanibe ew çîne rewşên bîr ê gelê ku ra û qoratên mîtolojiya wî digihe 4000 sal berî Îsa; ew çîn xwe hişyar û hişmendê xap û rîp û lîstikan bibîne, êdî dev ji xwe û xapandinê berde, were rayê, li rastiya gelê xwe xwedî derkeve çawa ye?

Pîrs 2: Mîtolojiya cihûyan bi xwe jî bi ra û qoratên xwe ve ancax digihê derdorê 1400 salî (beriya zayînê). Ol û mîtolojiya ariyan ku bûye bingeha cihûtiyê, filehtî (mesîhtiyê) û misil'mantiyê (ew stara ku bûye stana Bapora Nûh û di

nava xêşim û hêrikên dîroka kevnare û nûjen de bûye warê şîkêrê mêran), gelo babetê berhembêzkirina xet û xêzikên çelîkên xwe yên xwedî dil û ramanê tîr-cewher pêwistiye dernaxîne hemberî me?

Pîrs 3: Cewher û roniyên çavên Cemşîd (Yîma) ya di şikefta tîr-tevnepîrk û kevza evnikî de korişk, çilmisîmayî; di dîroka berdeyam de her û her li ber tefandin û tîkçûnê be, êdî bar û berhembêziya hilgirtina kar û bar nakeve ser milên neviçîrçîrkan? Ne heyf û mixabin e ku tov û bizrê xîret û rûmetê biqelihe, rê bide tawanbarî û gunehkariya sernixwîni?

Pîrs 4: "Alemî Cîhan" efsaneyên xwe derdixe, bi honandin û ristîneke hemdemî, tîr-nexşên nîgarî mezin û neqam dike. Stana kurdî ji her çar hêlên xwe ve goristaneke pîroz î tîrmêrxasiyên

efsaneyî ye. Her mal, malbat û oxaxê parçeyek dil û kezêba xwe di nava vê stanê de bi "dilojarê" veşartiye. Ev stana pîroz ne bes goristana kurdan bi tenê ye; bêşik gelê cîhanê tevan bi dunde û pêşiyên xwe di nava axa wê de veşartî ne. Ê ku hatiye şer, ê ku xwe li teiyan, war û mewdan girtiye. Gelo em zarokên wê axa pîroz çima di nava acz-î mewt de dijîn, lê xwedî dernakevin, bi berhembêzkirineke hempa nakin pîrozgeha cîhanê?

Pîrs 5: "Alemî Cîhan" li goriyên xwe xwedî derdikeve. Dev ji xwedî derketina li canfedayan berdî, em di nava kêlên şikestî û gorên wînda de newêrin eşkere "fatîha"yê bixwînin. Gelo tîrs bûye pareke dîrokî, yanê toqê gunehkariyê ketiye stûyê me, heya ku em li hemberî axa xwe serkubandî dijîn?

Sînemaya Şoreşê

Pudovkin piştî "Dê" filmek jî bi navê "Saint-petersburg" kişand, mijara vê filmê jî dîsa li ser gel û şoreşgeriyê bû. Kesekî ku şivan bûye û di şoreşê de cih girtiye, ev kes jî kurdên Tiflîsê ye, jiyana wî ya piştî şoreşê kişand.

Sînemaya Rojhilat her çiqas piştî Sînemaya Rojava dest pê kiribe jî di warê hunerê de li pêş Sînemaya Rojava ye. Kesên wekî Sergey Mikhailovitchev Eisenstein, Vsevolod Pudovkin, Aleksander Dovçenko di sînemaya Sovyetê de cihê girîng distînin. Di Sînemaya Rojhilata Dûr de jî Kenji Mizoguchi, Akiro Kurosawa, Yasujiro Ozu li Rojhilata Navîn jî derhênerê misrî Yusuf Şahin mora xwe li dîroka sînemaya Rojhilat xistin.

Li Sovyetê sînema piştî. Şoreşa October yanê şoreşa rezberê dest pê dibe, Sînemaya Sovyetê li ser hîmê perwerdehiyê hate avakirin, piştî şoreşê li Sovyetê akademyên çand, huner, zanistî û perwerdehiyê hate avakirin. Li Leningrad, Tiflîs, Kazakistan, Moskovayê û li pir deverên din studyoyên filman, salonên şanoyê hatine avakirin. Filmên ku li Sovyetê dihatine kişandin jî li her gundî, li her bajarî bi piştgiriya komarê dihatine nîşandan. Bi vê mebestê jî gel perwerde dikirin, der barê jiyandê de agahî û li ku çî dibe çî diqewime digihandine gel.

Di vê mijarê de derhênerê herî navdar Sergey Mikhailovitchev Eisenstein bi her awayî girîngî dida daxwazên gel û bi awayekî di sînemayê de gel derdixiste pêş, ne bi tenê di senaryoyan de, di çekirina filman de jî serlistikvan gel bû, ji bo perwerdehiyê Eisenstein hemû îmkânên gelêrî bi kar dianîn. Ji bilî wan li ser senaryoyan bi mehan lêkolîn dikir û pişt re filmê xwe dikişand. Li hêla din tiştên ku rengêkî taybet didine filman jî ji ber çavên wî nedirevîn, wekî filmê "Zirxiya Potemkin" ku di senaryoyê de dûxan tu-

ne bûye, Eisenstein li bajarê Odessayê serê sibehê dûxanê dibîne û dixwe senaryoyê. Bi vê yekê jî taybetiyeke surîştê dide film.

Eisenstein di sala 1924'an de filmê xwe yê yekemîn bi navê "Grev" kişand, di sala 1925'an de jî "Zirxiya Potemkin" kişand.

Mijarên van her du filman jî li ser serhildana gel bû, di her du filman de jî li hemberî rejîma Çar çawa serhildan pêk hatine, anî ser perdeya spî. Zirxiya Potemkin di 20 saliya Şoreşa 1905'an de bûye ku li bajarê Odessayê gel li hemberî rejîma Çar serhildan pêk anî. Film bi serhildana leşkeran dest pê dibe, pişt re serhildan pêl bi pêl li bajêr belav dibe û bi ser dibe. Di filma "Îvanê bi heybet" de jî şexsiyeteke cahil derxiste pêş, ev şexsiyeteke pişt re bi xwe dihesa.

Di sala 1931'an de Eisenstein ji Sovyetê vediqete, li hemû welatên Ewropayê digere, konferansan dide lê tu dewlet naxwaze li welatê wan Eisenstein filmekî bikşîne, heta Amerîka destûr nade ku bikeve erdê wan. Eisenstein diçe Meksîkayê li wê derê filmekî têkoşîna Meksîkayê bi navê "Que Viva Mexico" (Bijî Meksîka) dikşîne. Lê ji ber astengiyên aboriya saziyê ya ku film finansê dibe, ew nivco dimîne, Eisenstein film naqêdîne vedigere Sovyetê. Bi vê vegeerê çend filmên din çêdike û di sala 1946'an de di 50 saliya xwe de dimire.

Huner ji bo gel e

Derhênerêkî din di sînemaya Sovyetê de Vsevolod Pudovkin jî li ser pir mijarên gel û gelêrî film çekirin. Pudovkin li Sovyetê û li Rojava jî wekî afirînerê sî-



Dîmenek ji filma Zirxiya Potemkin

nemaya "Şoreşger" tê qebûlkin. Di sala 1926'an de romana Maksim Gorki "Dê" anî ser perdeya spî. Wî filmî rengêkî cihê anî sînemaya Sovyetê. Roman her çiqas dihat zanîn jî, lê bi kişandina filmê wê li Ewropayê jî ji aliyê dîmenan, psikolojiya listikvanan, ahenga di navbera dîmen û listikvanan de bal kişand ser xwe.

Filmên Pudovkin deriyê Ewropayê ji sînemaya Sovyetê re vekir, lê filmên Eisenstein heta sala 1950'î nehatin nîşandan. Piştî 1950'yî filma Zirxiya Potemkin bi tenê li Fransayê derkete pêşberê temaşevanan.

Pudovkin piştî "Dê" filmek jî bi navê "Saint-petersburg" kişand, mijara vê filmê jî dîsa li ser gel û şoreşgeriyê bû. Kesekî ku şivan bûye û di şoreşê de cih girtiye, ev kes jî kurdên Tiflîsê ye, jiyana wî ya piştî şoreşê kişand. Bi kişandina vî filmê Pudovkin cih, mijar, kesê kî dibe bila bibe girîngiyê nedayê. Bi tenê wî dixwest huner biafirîne. Pudovkin wiha digot: "Huner ji bo gel e, gel dema bê huner ma, dimire".

Piştî Pudovkin Aleksandir Dovçenko jî li ser her mijarê hinekî bi şeweya S. M. Eisenstein film çekirin. Her kesî jî bo Dovçenko digot:

"Ew tu carî, li ber tu kesî jî bo hunerê serî natewîne."

Dovçenko ji Ukraynayê bû, ji bo wî jî nijad, ol, îdeolojî, cih û kes muhîm nebû, bi tenê dixwest huner biafirîne. Ji ber wê jî pir dihat rexnekirin. Dovçenko bi eynî şeweyî film çekir û xwe bi wî awayî da qebûlkin. Filmê Dovçenko yê herî girîng bi navê "Turkisab" e, ev film li ser jiyana tirkên Asyayê ye. Di vî filmî de hevkarî, kolektîvîzm û têkoşîna bi kevneperestiyê re anî ser perda spî.

Di sînemaya japonî de filmên li ser jinan

Li Rojhilata Dûr jî derhênerên japonî

Kenji Mizoguchi, Akiro Kurosawa, Yasujiro Ozu sînemaya Japonyayê bi dinyayê dane nasîn. Mizoguchi piranî li ser pirsgerêka jinan, pest û pêkûtiyên ku mîr li jinan dikin, film çekirin. Filmên wî yê herî balkêş:

"Xwişkên Gionê", "Ji Naniwayê re şîn", "Serkeftina Jinê", "Jinên şevê".

Filmek jî li ser dîrokê kişand bi navê "Heft Samuray"; bi vî filmî xelat stand. Mijara film ji hefsed salî berê heta niha jiyana samurayiyê û aliyên wê yê dîrokî bû. Rexnegirên sînemayê digotin ku divê jin ji bo Mizoguchi rêz bigirin, ji ber ku ew qas li pirsgerêka jinan xwe-dî derket.

Yasujiro Ozu jî ji ber ku însanekî pir bêdeng û sade bûye wê jî di filmên xwe de nîşan daye. Hemû filmên xwe di jûngeheke sade û bêyî ku dîmen dekora tevlê bike, kişandine. Ji ber wê taybetiyê jî bala Rojava kişandiye.

Pişt re Kurosawa tê. Akira Kurosawa piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn hate nasîn. Derhênerêkî pir bi hêz û xwedî dîtinên nû bû. Kurosawa bi filmê xwe yê bi navê "Di Gelawêjê de Rapsodî" li ser Şerê Cihanê yê Duyemîn radiweste. Di vî filmî de bi riya tîkiliya malbateke japonî û amerîkî bandora bombeyên atomê yê ku Amerîkayê avêtin Japonyayê, tê nîşandayîn.

Li Misrê jî derhênerêkî pir mezin gi-hîşt; Yusuf Şahin. Şahin li Ewropayê xwendibû, bi çanda Ewropîyan mezin bûbû lê nixê xwe yê însanî her tim di filmên xwe de jî derxiste pêş. Filmên wî her tim li ser kevneperestiyê û têkoşîna bi kevneperestiyê re bûn.

Şahin piranî filmên xwe li Ewropayê kişandine. Filmê wî yê herî balkêş ku bi wî filmî xelat jî stand "Xak" e. Yusuf Şahin li hemberî rejîma Misirê bû, ji ber wê jî filmên xwe bi piranî li derveyî welatê xwe kişandin.

METİN AKSOY



Dîmenek ji filma Pudovkin a bi navê "Dê"



● 2.12.1993: Dadgeha Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê doza girtinê li Partiya Demokrasiyê (DEP) vekir. Yaşar Kaya gava ku serokê partiye bû, tevî heyetêkê di gulana sala 1993'yan de çûbû başûrê Kurdistanê. Li wir di 18'ê gelawêja 1993'yan de di Parlamena Kurdistanê de axaftinek kir, Kaya ji ber vê axaftinê hate girtin, paşê jî ev axaftin wekî sedema vekirina dozê hate pejirandin ji aliyê dozgerên tirk ve.

Pişt re jî ku endamên ERNK'ê Stasyona Trenê ya Tuzlaya Stenbolê bombe kirin, di vê bûyerê de gelek xwendekarên dibistana leşkerî hatin kuştin. Li ser vê yekê serokê DEPê yên nû Hatip Dicle daxuyaniyek da û diyar kir ku di şer de kesên bi uniforma hedef in. Ev gotin jî bû sebaba dozvekirinê.

dozvekirinê.

● 4.12.1995: Rojnameya muxalîf Özgür Ülke (Welatê Azad), li Stenbolê, navend û şaxa wê û buroya wê ya Enqereyê, li ser daxwaza MGK'ê û bi fermana Serokwezîr Tansu Çiller hate bombekirin. Di vê bûyerê de Ersin Yıldız şehîd ket û gelek xebatkarên rojnameyê jî birîndar bûn. Ji bûyerê jî dihat fêmkirin ku bi destê kesên profesyonel ev yek hatiye kirin. Hemû bombe di eynî wextê de teqiyabûn. Rêkûpêkiya bûyerê bal kişande ser dewletê, li ser vê yekê Wezîrê Karên Derveyî ji bo ku berpîrsiya dewletê veşêre îdia kir ku rayedarên rojnameyê bi xwe ev kirine.

AWIR

Konferansa Kurdolojîyê

Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, li Parîsê li ser kurdolojîyê konferansêkê li dar dixê. Dîroka destpêka konferansê 13'yê berfanbara 1996'an e. Ev konferans wê sê rojan bidome. Li gorî bernameya konferansê, roja peşî saet di 18.00 an de Îsmet Şerîf Wanlî bi danasîna axîfbêjên ku beşdar bûne, konferansê vedike û pişt re jî mesajên xwendin. Piştî Wanlî, Deniz Dargül wê li ser "Maneya Tevgera Rizgariya Kurdistanê di sedsala 20'an de", Ezîzê Cîho, li ser "Têkçûna Yekîtiya Sovyetan û guhertinên di polîtîka Kurdistanê de" biaxivin.



Di roja duyemîn de Îsmet Şerîf Wanlî li ser "Di dîroknivîsa Kurdistanê de pîrsîrêkên metodolojîk" raweste. Dûre Dr. Jabbar Qadîr axaftineke çavçoveya sernava "Çend dîtin li ser şexsiyetên Kurd di Dîroka nû de" bike. Selîm Ferat jî di konferansê de li ser "Têkilatiya têkoşîna Rizgariya Kurdistan û jiyana olî" bisekine. Pişt re jî Îsmail Gölbaş wê li ser "Kemalîzm û pîrsîrêka Kurd" biaxive. Piştî ku gotûbêj li ser axaftinên ku hatine kirin çebûn, navbera firavîn tê dayîn. Pişt re jî Dr. Jamal Raşîd li ser "Etîmolojîya Navên Erdnîgarî" yê biaxive. Piştî axaftina Dr. Ali Rıza Aslan û Hüseyin Kartal dîsa gotûbêj heye. Axatînen Dr. Siraç Bilgin, İlhan Kızıllan, Dr. Musa Kaval wê heta bêhnvedana ji bo xwarina şivê bidomin. Axatînen dawî ya roja dudiyar jî Suha Umut, Dr. Azad Hamoto dikin.

Di roja dawîn de Seîd Hesên dê li ser mijara "Nîrxandin û pîrsîrêkên wêjaya kurdî li sîrgûnê", Perwîz Cîhanî li ser "Ehmedê Xanî û filozofîya kurdî bisekine. Dûre jî sê axaftinên din hene. Ji wan Dr. Zerdest Hajo li ser "Pêşveçûna gotinên biyanî di zimanê kurdî de, Mazhar Günbat jî li ser "Standartkirina Alfabe ya Kurdî" wê biaxive. Û axaftina dawîn a konferansê ji aliyê Fergîn Melîk Ayoq ve tê kirin, mijar "Nîrxandîneke bîngehîn ya zimanê kurdî û rûberîna zaravên kurdî" ye. Konferans, bi konsêra hunermendên Akademiya Kurdî diqede.

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



"Bila di vê xwarinê de piçek xwê û xwêdana min jî hebe"

A lo rojbaş! Navê min Nêzîr e. Min telefona we ji hevalekî stand. Ez dixwazim bêm enstîtuyê ziyaret bikim. Ji kerema xwe re navnîşanê ji min re bibêjin." Belê, hema hema ji roja vekirina enstîtuyê heya îro gelek telefonên wiha tên. Carinan em diçin pêrgî mewanên xwe û carinan jî ew bi xwe rasterast tene xaniyê enstîtuyê û serî li me didin. Pîraniya mewanên bi destegul û bi diyariyan tên. Mewanên me jî kesên rewşenbîr û hunermend in. Ma ku rewşenbîrên kurd neyên enstîtuyê dê kî bîn?

Piştî telefonkirinê 15-20 deqîqe derbas bûn an na, zîla derî lê da. Hevalekî çû derî vekir. Xortekî 25-30 salî, bi kincên çermî ket hundir û sîlav da me. Em hevalên ku li wir amade bûn, me yek bi yek bi destê mewanê xwe girt û me xêrhatinê lê kir. Mewanê me yê nûhatî xwe bi me da nasandin. Ew ji aliyê Wêranşarê ye. Mirovekî karker e. Li Stockholmê kevîran çêdike û difiroşe. Pîr lêborîna xwe xwest, ji ber ku ji kar rasterast hatiye enstîtuyê, bi derengî ketiye, êdî dikan jî hatine girtin û nikaribûye bi xwe re destegulekê jî bîne. Me jê re got: "Gula herî-baş tu yî û ku tu hatî vir! Bi hatina te, em gelek dilşa û bextewar bûn!"

"Wiha nabe hevalino! Ez hatim ku we pîroz bikim. We ji bo gelê me karekî pîr muhîm kiriye. Qosqoca enstîtuyek vekiriye, ji me re hinek wezîfe derdikevin. Divê em jî alîkariya we bikin. Xebatên wiha ji destên min nayên. Lê ez jî dikarim hinek ji aliyê ekonomiyê ve alîkariya we bikim. Ez dizanim hûn hîn nû ne, ihtiyaciye we hene. Ez hatim ku hûn ji min re bibêjin ka çi ihtiyaciye we hene. Ji me jî çi qediya!" Min bi ken "Spas heval, hatina te, ji bo me alîkariya herî mezin e. Bi hatina te, dilê me mezin û dewlemend bû. Wekî ku kurd dibêjin "Dilê me bû behra Wanê!" Te moraleke mezin û xurt da me" gotê. "Bî Kurdistan nabe! Ez hatime ku hûn ihtiyaciye xwe ji min re bibêjin û ez jî li gorî quweta xwe ji we re alîkariyê bikim. Ez ji we re rast bibêjim. Ez mirovekî karker im, ne dewlemend im. Bila di vê xwarinê de piçek xwê û xwêdana min jî hebe."

Me kir-nekir, me nikaribû xwe ji destê mewanê xwe rizgar bike. Min lê vegehand: "Belê ihtiyaciye me bi hin makîneyan hene. Ev jî ji bo me barekî giran e. Em dê hêdî hêdî makîneyên wiha bikin..." Gotin di devê min de girt. "Ew çi ne û bi çi qasî ne?"

Min got: "Niha ji me re scannerek (skeynîrêk) lazim e ku em foto û tekstan bikin kompîturê". Pîrsî ku bi çi qasî ye, min gotê ku bi çar pênc hezarî ye. "Ka de ji kerema xwe re hejmara postgroya xwe bidine min!..."

Piştî xatîrxwestin û çûyina mewanê me yê xort, ez bi hûr û kûr fikirîm. Ne me ew nas dikir û ne jî wî em. Ev tiştê ku ew qas me nêzîkî hev dike, baweriya bi şoreşê ye. Baweriya gel ew qas xurt e. Ji aliyê din ve ew hinek kesên ku ji xwe re navê nivîskarî û rewşenbîriyê li xwe kirine û di bin vê maskeyê de, li ser navê kurdan çî dek û dolaban digerin, yek bi yek hatin ber çavên min. Wekî: Yê ku ji aliyê ve di roja 23'yê avrêlê yanê di cejna tîrkan de li Stockholmê bi konsolosê Tirkiyeyê re li ser pesndayîna Atatürk helbestan dixwîne û ji aliyê din ve jî, ji dewleta Swêdê li ser navê kurdan bi milyonan kron digire dibêje, "Ez kitêbxaneya Kurdistanê çêdikim" û mala xwe dike kitêbxane. Yê ku li ser navê kurdan roman û pirtûkan derdixe û yê ku serokatiya Federasyona Kurdistanê dike, pere ji dewletê digirin û bi wan pereyan diçe ji dewleta tirk re eskeriyê dike, yê ku bi pereyê reş buroya tûristîk vedike û tûristan dibe Antalya û Marmarîsê. Yê ku di kongreyê de bi îspat û sened bi sed-hezaran pereyê Federasyona Kurdan didize û di meyxane û qumarxaneyan de dixwe.. Yê ku pere ji dewleta Swêdê digire û diçe li Stenbolê bi sed hezaran pere dixwe û tê xwe li Yewnanîstanê vedişêre û dibêje "Tîrkan ez girtim..." Yê ku li Parîsê bi navê Enstîtuya Kurdî bi alîkariya çend tîrxîkxwaran ji xwe re malîxane vedike û ji Swêd û dewletên din bi milyonan pere digire. Nezanê Xwedê piştî kokteylidayînê, di xewn û xeyalên xwe de, xwe wekî Celadet Bedîrxan dibîne. Lê yên ku hîn navê wan nayên bîra min. Hemû li ser navê kurd û Kurdistanê dixwin û di navê de digevizin.

Lê, gel çî dike? Kevir dibire, erd û beççe dikole, di fabrika û daîreyan de kar dike, pembû, genim, û nîsk diçine, zeytûnan berhev dike. Ji qirika xwe û zarokên xwe dibire û alîkariya dem û dezgehên xwe yê neteweyî dike. Di ser de jî li dijî zilm û zordariya dewleta tirk li meydana û kolanên Ewropayê meş û mîngan li dar dixê. Xwe ji bo gelê xwe dişewitîne. Kampanya xwe dide, zarokên xwe ji Ewropayê dişîne çiyayên Kurdistanê. Gelê Kurd dê dîr nêzîkî ji van kes û der û doran yek bi yek hesab bipirse. Ew nikarin bi hêsaniyê hesabê van 15 salên dawiyê bidin. Dev ji hesabê gel berde, ew nikarin ji niha ve hesab bidin dê, bav, xwişk, bira û mirovên xwe. Gelo dê ew bi çî rû û rengî...

Ji bo cîhanîbûnê netewetî qonaxeke pêwîst e

Şerê kirêt bi tenê zîrarê nade gelê kurd her wiha jî civaka tirk ji her alî ve dixwe nava arîşeyan. Bi taybetî ji aliyê aborî ve hemû kanên dewletê ziwa dike. Li hemberî vê yekê rayedarên dewletê ji bo ku şer bidomînin ji butçeya tenduristî, perwerdehiyê qut dike, bi butçeya şer ve berdide. Li hemberî vê yekê gelê tirk û kurd ên kedkar dengê xwe bilind dikin naxwazin barê şer hilgirin ser milên xwe.

Bi nîqaşkirina gelşên perwerdehiyê, di 7-8'ê berfanbarê de komcivînek tê lidarxistin. Hevalê me AZAD ALTUN bi amadekarên komcivînê re hevpeyvînek çêkir.



Em dixwazin ramanên we yên li ser perwerdehiya demokratîk hîn bibin. Perwerdehiya demokratîk çi ye li gorî we?

● (Erol Yılmaz ji komiyona ciwanan a HADEP'ê) Berî vê divê em rewşa siyasî û civakî ya Tirkîyeyê deynin holê. Ji ber ku perwerdehî îdeolojîk e, mirov nikare wê li derveyî siyasê bî-nîrxîne. Ji mêj ve wisa bûye, di navbera desthilatiya siyasî û perwerdehiyê de têkiliyek hebûye. Niha heke em werin ser rewşa xwe ya taybet, pîrsgirêka perwerdehiyê wekî gelşeke sofîner derdikeve pêşberî me. Berî avabûna komarê jî, piştî avabûna komara tirk jî di warê perwerdehiyê de zêde tişt neguherîn. Li Tirkîyeyê perwerdehiyê, piştî avabûna komarê, roleke hîn şovenîst, pişefkar (asîmîlekar) û paşverû hilgirt ser milê xwe û ji mebesta xwe ya bîngêhîn (ronîkirina bîra mirovan) avarê bû. Sîstema perwerdehiyê ya tirkan ji naveroka akademîk, pîvanên zanistî û gerdûnî dîr ketiye. Li hemberî neteweyên ku ne tirk in, her tim bûye xwediyê helwesteke paşverû, înkarker û pişefkar. Sîstema perwerdehiyê ya tirk, bûye rêxistinî, belavkar û berdevkê îdeolojiya fermî. Sîstemeke ew qas ji naverok zanistî, pî-

vanên gerdûnî dîr, divê li ser maseyê bê ramedandin, ji bo timarkirinê. Me, ji ber vê pêwîstiyê, dest bi rêxistina platforma Komcivîna Perwerdehiya Demokratîk (DEK) kir. Wekî ciwanên HADEP'ê jî bi vî çavî me li komcivînê nihêrî. Bi mebestê em bûn rêxistinîkaranê ve komcivînê.

L

i Tirkîyeyê perwerdehiyê, piştî avabûna komarê, roleke hîn şovenîst, pişefkar (asîmîlekar) û paşverû hilgirt ser milê xwe û ji mebesta xwe ya bîngêhîn (ronîkirina bîra mirovan) avarê bû. Sîstema perwerdehiyê ya tirkan ji naverok akademîk, pîvanên zanistî û gerdûnî dîr ket.

Me xwest komeleyên xwendekaran, sendîka û partiyên siyasî bixin nava çalakîyên amadekarên komcivînê. Pîrsgirêka perwerdehiya ji sê aliyên ve xwe nîşan dide; ji aliyê xwendekar, mamoste û malbatan ve. Lê her yek ji van bi berçavka xwe li meseleyê dinêre û xwe bi vê sînor dike. Li gorî me divê ev her sê alî bîn ba hev û bi berçavkeke gştî li mijarê bê nihêrtin, lewre jî em xebata kom-

civîneke bi vî rengî dikin. Her wiha me xwest hemû hêz û derdorên demokrat, pêşverû û dijber di komcivîneke berfirê de bînin ba hev, vê mijarê nîqaş bikin.

● (Hakan Gönaslan Serokê ÎÜ-DER'ê) Îro mora çînayetiye li ser perwerdehiyê heye. Burjûvazî li gorî dax-

tê çînen serdest derkeve.

Îro li zanîngehan serdestiya îdeolojiya senteza tirk û îslam heye, pest û pêkûtiya polîsan heye, sermayedar dixwazin ji wan deran kadroyên teknîk ji bo karê xwe bigihînin. Zanîngeh ji mebesta xwe dîr ketine, zanyar nikarin lêkolînên zanistî bikin, rêveberiyên zanîngehan ji derve tînin şandin. Kesên ku zanîngehê dikin zanîngeh, nikarin rêveberên xwe bi xwe hilbijêrin. Mafê endamên zanîngehan çi xwendekar, çi zanyar û çi jî kedkar tune ye ku rêxistinên xwe ava bikin. Em wekî destpêk dixwazin ev rewş biguhêre. Ji bo guhertina vê rewşê divê xwendekaran zanîngehê rêxistinên xwe ava bikin. Em dixwazin ji vê komcivînê rêxistineke yekgirtî ya xwendekaran derxin, lê em têkoşînê bi zanîngehan sînor nakin, ji ber ku malbat jî ji vê rewşê zîrarê dibînin, perwerdekar jî ji rewşê bêzar in. Em dixwazin hemû kes û sazîyên ji vê rewşê zîrarê dibînin, bixin nava komcivînê. Perwerdehî êdî tê arizîkirin, bi pere dibe. Dewlet ji sedî 30-40'ê butçeyê ji bo şerê kirêt vediqetîne, lê ji bo perwerdehiyê bi tenê ji hezarî 3 tê tarxankirin. Li aliyekî rayedarên dewletê dibêjin pere nîn e, li aliyê din pereyên mezin didin zanîngehên taybet

û zanîngêhên weqfan. Em dixwazin pe-re ne ji bo şer, ji bo perwerdehiyê bê ve-qetandin. Wekî komele em doza zanîngê-heke demokratîk û xweser dikin. Ji xweseriya zanîngêhê em, xweseriya aborî û rêveberiyê fêhm dikin, bi van re wê xweseriya zanistî jî pêk were. Ji vê komcivîne jî hêviya me ragihandina doza xwe, xurtkirina bereyê dijber û der-xistina hinek projeyên alternatîf e. Yanê divê xwendekar bi rexnekirîne nemînin, hin projeyên alternatîf jî pêk bînin.

● (Gonca İtmet, Seroka İDLB'ê) Her wekî hevalan jî got, perwerdehî îde-olojîke. Bandora neyînî ya vê sistemê li ser xwendekarên zanîngêhan çawa be, li ser xwendekarên lîseyê jî wisa ye. Nû-nerên bîrdoza burjûva ji bo ku diwaro-ja xwe misoger bikin, xebatê dikin. Ew dixwazin mirovên ku wê xizmetî siste-mê bikin, ji lîseyan derkevin.

Niha sistema perwerdehiyê paşverû ye, mafê derbirîne nade me, perwerdehî bi pereyan e. Ji naveroka pirtûkan bigi-rin heta nêzikîtedana rêveberan, ew îde-olojîya kevneperest qedera xwendeka-rên lîseyê tayîn dike.

Dema em bala xwe bidin pirtûkên dî-rokê, wekî ji mêj ve bi tenê neteweyek hebe li Tirkiyeyê, dîrok tê şîrovekirin. Wek mînak, dersê "Millî Güvenlik" an-go ewletîya neteweyî heye. Di wan der-san de pesna sistemê tê dayîn, hemû we-latên cîran wekî dijmin tene destnîşanki-rin. Dixwazin tîpekî taybet î mirovan derxin holê, bi wê jî dixwazin cil û ber-gên yek-cure pêk bînin. Her wekî çawa ku leşkeran perwerde dikin, dixwazin xwendekarên lîseyê jî wisa perwerde bi-kin.

Piştî derbeya leşkerî hemû mafên de-mokratîk ji holê hatin rakirin. Dersên ewletîya neteweyî (Millî Güvenlik) we-kî pêwistiyeke serdema cuntayê xistibûn rojevê, lê îro dixwazin dersên "Ter-ror-anarşî"yê bidin xwendekarên. Êdî dersên ewletîya neteweyî bersivê nadin daxwazên rayedarên tirk, lewre jî di-waxzin bi dersên teror û anarşîyê li dijî tevgerên azadîxwaz propagandaya xwe bixin serê xwendekarên.

Li aliyê din perwerdehiya bêpere ma-fê me ye, em vê dixwazin. Ji ku ber mal-batên me jixwe ji bo perwerdehiyê bacê didin dewletê, çima careke din pereyan bidin. Dewletê ji bo xwestina pereyan, tengasiya aborî nîşan dide lê em dizanin ku pereyên ku wekî bac ji gel tên ber-hevkirin li şer tene xerckirin, lewre jî dewlet ketiye nava tengasiya aborî.

Her wiha astengeke li pêşiya xwen-dekarên lîseyê ezmûnê ji bo zanîngêhê ne. Her çiqas rayedarên dewletê qala wekhevîyê bikin jî, em dizanin ku xwendekarên li Kurdistanê dixwînin, an jî li taxên li guhê bajaran dixwînin ne mîna yên li kolejan dixwînin in. Ji perwerdehiya demokratîk em guherîna rewşa ku me li jor da zanî fêhm dikin.

Li gorî pîvanên perwerdehiya gerdû-nî çî ne, zanistîbûna perwerdehiyê tê çî wateyê, helwesta dewleta tirk a li hem-berî pîvanên navneteweyî çawa ye?

● (Erol Yılmaz) Sistema perwerde-hiyê ya tirk deriyê xwe ji hemû qewmî- û perisînen nûjen re girtiye. Bo nimûne



dema mirov bala xwe dide Ewrûpayê, bi pêşketina civakê jî, sistema perwerdehi-yê hin guherîn derbas kirine, her wiha ew bûye sedema pêşketina civakê jî. Li wan welatan ne bi giştî be jî, hinekî ji bin nûrê desthilatdaran derketiye.

Li wan welatan jî perwerdehiyê li dê-ran dest pê kiriye, paşê ketiye bin destê dewletan û komên berjewendperest, lê piştî hinekî ji bin bandora wan derketi-ye, piçekî nêzî mebesta xwe ya bîngêhî bûye. Lê sistema perwerdehiya tirk qet neketiye bin bandora wan guherînan. Li ser kevneşopa berê çûye.

Li gorî we perwerdehî çî ye?

● Nêrîna me ya li perwerdehiyê wi-ha ye; ew divê xizmetê bike ji mirov, si-ruşt û çandê re. Hêzên kevneperest û paşverû dixwazin perwerdehiyê ji vê mebestê dûr bixin, wê ji bo armancên xwe bi kar bînin. Tiştê ku em dixwazin bi vê komcivîne bikin jî ev e; pîvanên perwerdehiyeke zanistî çî ne, perwerde-

Perwerdehiya bi zimanê biyan, mirovan dixê nava hinek aloziyan. Ji ber ku zarok dema diçe malê, an jî dema ji dibistanê derdikeve, bi malîyên xwe re, bi der û cîranên xwe re bi zimanê zikmakî dipeyive, lê li dibistanê bi zimanekî din perwerde dibe.

hiyeke çawa wê xizmetê bike ji mirovan re, em dixwazin di vê komcivîne de nî-qaşa van tiştan bikin. Em dixwazin bi vê komcivîne bibin hêza çareseriyê.

Hûn tîkiliya perwerdehî û zimên çî-wa dibînin?

● (Aydm) Niha, heke pêdivî tunebû-ya, ziman dernediket holê. Pêdiviya mi-rovan bi zimên heye; divê mirov bipeyi-vin, bidin bistînin, ji hev fêhm bikin.

Gelên bindest bêgav mane ku xwe bi

zimanê gelên serdest xwe îfade bikin. Lewre bandora sitemkaran mirov xistine rewşa "xwe biçûkdîtîne." Perwerdehiya serdestan gelên bindest dixê nava vê psî-kolojîyê. Her tiştê aîdî gelên serdest tê nepixandin, yê aîdî gelên bindest biçûk tî dîtin.

Komara tirk bi politîkayên xwe yê- dîrî rastiyê, hem zimanê xwe dilewîfîne, hem jî rê li ber geşedana çandên din di-gire. Ji bo demokratîkbûna sistema per-werdehiyê komara tirk divê berî her tiştî, mafê perwerdehiya bi zimanê zikma-kî bide kurdan.

Dema mirov li biryara UNESCO'yê ya bi mêjûya 14.12.1960 dinêre, tê dîtin ku di perwerdehiyê de li ber çavan gir-tina cudatîyên nîjadî, zimên, baweriyên siyasiyê û civakî, neteweyî qedexe ye. Tir-kiyeyê digel vê biryarê, gelek madeyên wekî vê jî îmze kirine, lê guh nade van biryaran. Zimanê mirovan ango navgîna mirovan a derbirîne divê serbest be.

● (Erol) Perwerdehî û ziman ne tiş-

dorê li jiyana wî ya ciwanîyê dike.

● (Hakan) Mirov dema nikaribin bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibin, ew perwerdehî çiqas wê bi kêrî wan we-re, wan bi pêş bixê? Perwerdehiya bi zi-manê zikmakî rê li ber mirov vedike. Her wiha qedexeya li ser perwerdehiya bi zimanekî rê li ser geşedana wî zimanî jî digire. Yanê, dema bi zimanekî per-werde çênebe, xebata zanistî pêk neyê ew ziman li paş dimîne. Ev qedexe he-bûna ziman tehdît dike, îro li Tirkiyeyê gelek ziman li ber mirîne ne.

Îro dema em dibêjin, perwerdehiya demokratîk û zanistî mebesteke me jî ev e ku li zanîngêhan bi zimanê kurdî lêko-lînên zanstî bînin kirin, berhem bînin dayîn. Divê bê gotin ku, dema em qala perwer-dehiya bi zimanê zikmakî dikin qesta me ne ev e ku dewlet îdeolojîya fermî bi kurdî bide zarokên kurd, em dixwazin ku gelê kurd bi zimanê çanda xwe û he-bûna xwe biparêzin, bi pêş ve bibin.

Tîkiliya zimên û nasnameyê çî ye?

● (Hakan) Perwerdehiya bi zimanê biyan, mirovan dixê nava hinek alozi-yan. Ji ber ku zarok dema diçe malê, an jî dema ji dibistanê derdikeve, bi mali-yên xwe re, bi der û cîranên xwe bi zi-manê zikmakî dipeyive, lê li dibistanê bi zimanekî din perwerde dibe. Ev yek di-be sedem ku dubendî di şexsiyeta wî de çêbe, ew kes bi xwe re bikeve nakokiyê. Bo nimûne zarok ji ber ku bi zimanê xwe dipeyive, ji mamosteyan lêdanê dixwe, tîne cezakirin.

● (Erol) Gelê ku netewetîya wî bin-dest be zimanê wî bindest dibe. Gelê ku rê li ber geşedana netewetîya wî hatiye girtin, di warê çand û zimên de jî tê ten-gavkirin. Hêzên dagirker dixwazin mi-rovan ji gelê bindest bi çand leşkerî per-werde bikin. Bo nimûne, niha li Kurdis-tanê dibistanên birazangeh (Yatılı okul) hene, perwerdehî li wan dibistanan dix-waze hemû nîrxên tîkildarî kurdîyê jî holê rake. Nîrxên neteweyekê herî baş zimanê wê neteweyê dinimîne.

Pexşaneşîrek bo hawrêm

Leyla Zana



Bo ser singî hezaran kiçi Kurdistan..
Eger ta diwênêy tenha bûy le senger da
Emro hemû hâwar dekeyn;
"Hey cendirme, cendirme
Derkevin ji welatê me"

Hawrêy dûrim..
Çawim lête
êsta le zîndane serşorekey
Ataturk da
Danîştuyt û be binmiçî dîwarekan da

Bîr û hoşit dawete dest espê xeyal
Tawêk detbat bo Amed û Mehabad û

Lewêşewe bo Qamişlî.
Tawêk debît be guleyek
Bo tifengî gerilayek
Tawêk debît be parûyek
Bo rêbwarêkî şekelî rêgay rizgarî

Tawêk debît be reşmalê
Bo xêzanêkî bê dalde û mal sûtawî
Lice û Helepcey bê nazim..
Tawêk deçite ser lûtkey Ararat û
Şerî celadekan dekeyt.
Takû denge nasazekey cendirmeyek
Le pîrêk da..
Petî xeyalit depsênê û
Detbatewe naw zîndanekey Ataturk
Ax zîndanekey "Ataturk"

Hawrêm Leyla;
Eger rojê
Em nameyem be tenîsta gûzerî kird
Bê têrman û serinc dan
Deynasyewê.
Çûnke pûlî hiç postêkî pêwe nîye.
Pasaportî
Hiç welatêkî pê nîye
Bê nasname ye wek xoman
Le zîndanekey em diwî parçey çigerî
Bo zîndanekey ew diwî parçey çîserim e
Le Basûrî birînmewê.
Bo Bakurî birînmewê.
Le mirovêkî çewsawey bê alawê
Bo mirovêkî çewsawey bê ala ye.

Bûkî "Amed"î sing sûrim
Kê ye le zamî to tê bigat
Cige le minî bira ziyatir!?
Kê le siwêy sûtan tê degat
Cige le minî kilpe û agir!?
Xot dezani,
Lew rojewey çaw jînekan
Kêls dilnawîyan dabey kird
Lê herêkî
Sêg û sedan
Em û kalwastî û zînkaw
Bûb be sunay here diyarî rojwastan.
Lêre lewê
Em bi lewê

Le her parçeyekî dilim
Sedan zîndan
Bo azadîm dirûst dekrê
Sedan pet û qenare bo
Le dayik bûnim heldexrê..
Zîndanekey, kelêpçekan
Pêwendekan, bizmarekan,
Le yek deçin..
Tenha ciyawaziyek hebê
Nawî ew dezgayane ye
Em dahênane mezine berhem dênin..

Kizey cergim
Ger detewêt
Dengûbasî niştimanit bo binûsim
Hêsta zîndanekey mawin..
Le her bistêkî xakekem
Sedan cendirme riwawin.
Hêsta yadî Seyid Rizay Dersim qedexe

Hêsta peykerêk bo Zekiye
Cê nekirawe..
Hêsta Nizamedin Toğuş
Şiwên birîni gulekanî sarêj nebûn
Hêsta nawî baxê, şaxê,
şarê, darê
Tule rêyekîş be nawî
"Bêşikî" yewe nenirawe..
Hêsta piyawê bîste bala bê abriwêkan
Nikolî bûnişman deken..
Belê hawrêm,
Hawrêy pêbendî naw zîndan
A eme ye tazetirîn dengûbas û
Jani birîni Kurdistan..
A eme ye bê abriwî û
Nizim tirin
Nirx û behay dagirkeran..

Belam hawrêm,
Xuşkî dilsaf û bêgerdî
Wekû befrim
Kiçe kiwêstanî ser berzim
Wekû Helgurd û Agirî
Aram binû. Dilniya be
Emro be lay darberûyekî
Kone sal da gûzerim kird
Bangî kirdim û pêy witim:
Dilniya bin,
Pêwendekan
Herçende tokme û estûr bin
Her depisên..
Şûra û qelay zîndanekey
Her çend bilind bin derûxên..
Dagirkeran
Çend behêz û zebr û zeng bin
Her debezên..
Şere jînekey "Amed"îm dilniya be
Aram binû
Emro sibey
Her debezên
Her debezên.

Gularekem,
Gil estêre
Min dem zanî ew rêgayey to girtute.
Bestelek e, temtûman e, sext e, dijar e
Heldêr e.
Min dem zanî,
Serqasleçî karwanêkî
Pêwîst e rêçê bişkênê.
Belam zor çak dilniya bûm
Sille şewezeng nakeyt û
Cilewî espit ber nadeyt
Gîvey ziryan û reşeba û
Lûley gurg natirsênê..
Dilniya bûm gilarekem, dilniya bûm.

Ey rêbware mandû,
nenasekey rêgey
Pir meynetim..
Min lem diwî sinûrewê
Giwêm le tirpey pêyeknet e û
Kispey germî dilî pir hîwat debisim.
Giwêm le ziringey zengoley
Espe şête.
Çak dem zanî,
Detwîst zeng bo kê lê bidey
Niyazit wa bû.
Çawî nûstû, dilî mirdû
Raçelekênî..
Gomawî meng bişeleqênî.
Xorêkî tir,
Li asmanî em welatî reşoşe da
Dagîrsênî.

Leyla xanî xuşk û dayik û
Hawrê û hawjan û hawxebat
Ke ser dekewime ser piştî Pîremegrûn⁽¹⁾
Pîrçe sipiyekey Ararat bedî dekem
Ke le zamî Babagûrgûr⁽²⁾ wîrd debmewe
Birîni besiwêy "Amed"îm dêtewe yad
Hawrêm Leyla:
Em rêgayey yek rêga ye

Em mebeste yek mebest e û
Janman yek jan..
Hemû şitêkman wek yek e
Le dayik bûn, pîr bûn, mirdin
Çewsanewe û xoşewîstî û
Kispe û giryan,

Hawrêy azîz:
Êstake to
Kiçi befrî û xiwên û jîyan û berxwedanî
To momêkî dagîrsawî
Tarîkî şewim raw dekeyt
Şemşeme kiwêrekanî serdem
Lê detirsîn
Boye le kuncî zîndaniyan tirincanî..
Dilgîr mebe hewrêy hêja, dilgîr mebe
Êstake to;
Kiçi şoreş, bûkî sûrî serhildanî.

Peyameket pîroz e wek peyamekey Şexî
Pîran,
Sû re wek kifnî şehîdan.
Pak e wek xwênî be naheq rijenrawî
Mûsa Anter, Mihemed Sincari hawrêt.
Bilêsedar e wek girî Newrozekey
Zekiye Alkan
Germ tir e le henasey pir hesretî Mehdi
Zana

Dilniya be kiçi şoreş, dilniya be.
Serbilindî wekû serî Mameyare⁽³⁾
Zîndanekey serşor e wekû Bastî
Supay cendirmeyê lertzok û tirsonê⁽⁴⁾
Wekû supakey Frayzer.
Dilniya be hawrêy serqalî xebatî
Dilniya be..
Eger ta diwênê be tenha alay ke
Dekird be gul bo berokî,
Emro bote gule şilan



Li NÇM'ya Stenbolê bernameya çalakîyên vê hefteyê:

● 01.12.1996 **Yekşem**

Konser: Ji Atolyeya Hunerî ya Hemdem (ÇSA) Grup Serûven, saet: 14.30
Teatra Jiyana Nû: "Doza Generalê Teneke", saet: 17.30

● 04.12.1996 **Çarşem**: Semîner: "Hiqûqa li ser şer a Cenevreyê",
axîfbêj: Bedia Buran-TOHAV, saet: 18.00

● 06.12.1996 **În**: Film: Welat û Azadî, Gerînde: Ken Loach, saet:
18.00

● 07.12.1996 **Şemf**: Teatra Jiyana Nû: Doza Generalê Teneke, saet
17.30

Li BEKSAVê çalakîyên vê hefteyê:

● 01.12.1996 **Yekşem**: Film: "Tayfa-Macera-Kont", Charlie Chaplin,
saet: 18.00

● 04.12.1996 **Çarşem**: Film: "Tayfa-Macera- Kont", Charlie Chaplin,
saet: 18.00

● 05.12.1996 **Pêncşem**: Film: Zêmar (Ağit), Gerînde: Yilmaz
Güney, saet: 18.00

Li Evrensel Kültür Merkezi vê hefteyê: Şano: Kûçikên Dayika Carrar
(Carrar Ana'nın Köpekleri), saet: 18.00

● 02.12.1996 **Duşem**: Film: Birayên Cazwan (Cazcı Kardeşler) Saet:
17.00-19.30

● 05.12.1996 **Pêncşem**: Film: "Mamê min Hitler", saet :17.00

RÛDAN

Paganîzma kurdan û derwêşiya tirkan

N. Marr, yêzîdîtiya ku di nav kurdan de tê dîtin, ola kevnar dihesibîne û derwêşiya Anatolê ya tirkan bi yêzîdîtiyê ve girê dide. Dîsa di sedsala 14'an de helbestvanên tirk "çalab" û "çe-lebî" bi kar dianîn. Ew biwêj ji kurdan derbasî tirkan bûye.

Gelo ji bo çi kurdan welatê xwe li hemberî selçûqîyan bi yekîfî neparastiye? Ji bo çi selçûqî wekî guran ketine nava kurdan û ew bela wela kirine; kurd li hev û din kirine dijmin, hem baca xwe ji kurdan standine hem jî di her şerî de kurd jixwe re kirine lêkan? Begên kurdan ji bo çi bûbûn nobedarên tixûban? Ew rast e ku hin toreyên ku ji kurdan derbasî jiyana tirkan bûne, îro tirk wan ji xwe re dihevişînin...

Mirov dikare bibêje ku berê zêde li Mezopotamyayê bi xwe re begîfî pêk anî, wê jî xulamî di jiyana civakî ya kurdan de derxist holê. Her wiha jî begîfîyê nehiştiye ku hezkirineke neteweyî li ser reha jiyana kurdan şîn bibe. Ji bo began ev berjewendiyên begîfîyê girîng bûne.

Di têtikîyên kurdan û selçûqîyan de baş xuya dibe ku birakujîya kurdan di vê demê de jî ne kêmbûye. Ji ber ku şaristan li Mezopotamyayê pêş de çûbû, zanistî û perwerdehî jî bi pêş ketibûn li hemberî began û dagirkeran gelê kurd li rê û çareyan geriyaye. Di çanda xwe ya kûr û dorfireh de li gorî mercên jiyana wê demê terîqet ava kirine û mirovên zana û pêşverû wekî "Serzêrîn" bi nav kirine. (Tirkan ev gotin qulibandine û hêj jî wekî heqaretê tînin ziman. Di jiyana şexsî de mirov dikare derewan biavêje stûyê miriyan, lê mirov nikare derewan biavêje stûyê gelan. Dema gel rizgar dibin xaniyê ji derewan jî di ser derewinan de hildiwese.)

Hin lêkolînerên pişpor dibêjin ev terîqetên kurdan ji ola îslamê û ji derwêşiya anatoliyayê re bûne tirêj û xîm. Ji tirkan hew Doğan Avcioglu lêkolînen berfireh çêkirine; ji hêla dîrokê ve pirtûkên wî xuya ne. Avcioglu her çiqas têtikîyên kurdan û selçûqîyan li gorî kemalîzmê şîrove kiribin jî, nema karibûya tiştinan veşêre. Ev nivîsa li jêr min ji pirtûka Doğan Avcioglu Dîroka Tirkan (Türklerin Tarihi) cilda 4'an,

rûpelên 1524-1525'an wergirt û wergerand kurdî.

"Ferat di Meletiyê re, Çemê Zêrîn jî di Qoçgiriye re derbas dibe. Di qada her du bajaran de bi berdehamî pevcûn hebûn. Di herêmê de bi navê "pavlakî" yan (paulciyen) xiristiyanên ku dijminê dêr û dewleta Bizansiyan bûn, bi cih bûbûn.

Pavlakîyên ku li çarmedora "Divriği" yê civiyabûn ji gundiyan û ji xizanên bajaran pişt digirtin...

Tevgera pavlakîyan li balkanan jî Tevgera Bogomîl re dibe çavkanî. Têtikîyên ku di navbera pavlakî Baba İshak û bogomîl Şeyh Bedreddîn de girîng in, divê li ser bête rawestî. "N. Marr" li devera pavlakîyan yêzîdîtiya ku di nav kurdan de tê dîtin, di çarçoveya îslamî de berdehamiya ola kevnar dihesibîne û derwêşiya Anatolê ya tirkan bi yêzîdîtiyê ve girê dide. Dîsa li gorî îddiyê di sedsala 14'an de helbestvanên tirk biwêjin "çalab" (Yêzdan) û "çelebî" (yên di rîya Xwedê de dimeşin) bi kar dianîn. Ew biwêj ji kurdan derbasî tirkan bûne.

"Bertold" jî derwêşiya Anatoliyayê bi yêzîdîtiyê ve girê dide: "Paganîzma kurdan, bêsîk, hikarî li derwêşiya Anatolê û li jiyana misilmanan a olî kiriyê. Terîqeta kurdî ya ku bi navê "Ehl-î Heq" ku li Îranê belav bûye jî wê îbat dibe.

Di pirtûkên Doğan Avcioglu de navên hin begên (mîr) kurdan wisa hatine nivîsandin.

" Dilmaç..... Dil-maç
Mirdas..... Mîr-das
Mervan..... Mêr-van
Hezarhesb..... Hezar-hesp
Revadi..... Rê-va-dî
Derguzini..... Der (î)-guz-îni
Bazdar..... Bazdar
Barankuş..... Baran-kuş
Berçem..... Berçem

* Di çanda kurdî de "Çelo" hê jî wekî navê mêran tê bikaranîn.

JÊHAT GINGIM

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Alî Şêr

Ewro, roja 27.11.1996, bêguman rojêde pîroz a. Qedrê na roje hetê şarê ma ra rind êno dayene û famkerden. Naye rê jî ez na roja ma şarê marê pîroz kenaz û hurêndiya na roje de, temayêde bine ser ro vindena. Sebeta ke niviso min o verên Sey Rizay ser ro bî, ez wazena na roje jî Alî Şêrî ser ro tenê bivinderî.

Derheqê nêmerd serok, hozan, dewrêş, şervan Alî Şêrî de nivis û materiyaftî kaf kemî yê. Yê estê jî, zafêrî yê îdeolojiyê resmîye, hetê pëyanê dewlete amê nivisnayene û "xirabiya, canawariya" Alî Şêrî anê re zon.

La belê her çîqa ke nê "xirabiya" Alî Şêrî vanê jî, ma şîkînimê nînan ra gumra çîyan vecîme. Seba naye jî ez wazena ver de nînan ra çend paragrafa seba wendekarê ma cêr binivîsnê.

Nutuk'ê de "Alîşîr, aşma martî 1920 de Ovacik û Xozat de şarî re propoganda keno." "Angorê N. Sevgenî keso ke pê perda de nê karan keno, Alî Şêr o."

"...serra 1921 de serokê aşîreta Qoçgîrî Heyder Beg, Stenbul de Sey Abdulkadir ra talimat gêno. Naye ser ro Alîşan û mordemê dê Naki, Alî Şêr dest bi sarewedardayene kerd." Suat Akgül pirtûke xo, "Dîroka maya newiye de, Şerê Dêrsimî û Raştîyî" de nivisneno ke: "Ganî bêro qebûlkerdene ke meselaya Qoçgîrî 1918 ra dest kerdo ci. Alîşerî rojnameya "Jepîn"î nê serran de vata. ... Afê mahkemeyî ra (mahkemeyê Sêwazî) teyana Alî Şêr û N. Dêrsimî feyde nêvînenê."

Wunciya Suat Akgül pirtûke xo, Dîroka maya newiye de, Şerê Dêrsimî û Raştîyî" de nivisneno ke: "Nê kesana, asiyanê ze Zalim Çavuş û Alî Şêrî yê ke demêde dergo na derdorde xebetîne, cesaret guret û sare dard we. ... Na dem de propogandaya tenê hermeniyane ke Suriye ra amêne û Alî Şêrî tayê aşîran ser ro tesîr viraştene. ... Alî Şêr demê sarewedardayena Araratî de wilakerdekê Xoybûnî wertê aşîretanê Dêrsimî de kerdene wilo. ... Sey Riza sebata ke hetkariya tenê dewlatan bigêro, wertê nînan de Îngîlistan jî esto, waşt ke Alî Şêrî biruşno teberê welatî. Ham 9'ê aşma temuzî (tîrmeh) 1937 de kîştana Alî Şêrî ser ro na waştene nêresena dawîye.."

Se ke cor jî hejo wendene; Alî Şêr poropogandîst, ajîtator, rojnamevan, şervan û diplomat biyo. Pêrîne ra mûhîm Alî Şêr qe rojê koledaran ra af nêwaysto, teslîm nêbûye û nêyamo afkerdene. Na, serokatiya kirmanciye de demê xo de çiyêde jîyîn o. Hetanî o dem qe nibiyo. Esas girsîya Alî Şêrî, moderbiyena serokatiya de jî na ca de wedardayî ye. Kirmanciye de hetanî Alî Şêr û Alî Şêrî ra dime jî hetanî serokatiya ewroyîne ya moderne. ne qe nasîbê jû serokî nêbiya.

Na darheq de M. Kalmem pirtûke xo, ebi dokumentan û şahedan Sarewedardayanî Dêrsimî de niya nivisneno: "Nameyo bi qedro bîn jî Qoçgîrî de Alî Şêr bî, Sekreteriya Heyder Begî kerdene. Hozan bî. Demêde Rûsya de îltîca kerda, pêco cêro ra. Şerê dinya ya 1. de Dêrsim de ebi serleşkera nê hermeniyane qese kerdo, la belê tê sare nêkerdo. Ma ê bado xebatê Qoçgîrî de rêyna vînenîme."

Alî Şêr kaleka şervaniya xo de, hozan o jî. Ebi klamanê xo zerê şarê ma fetkerdo, kerdê heşar, dê şer kerdene. Derheqê hozaneya Alî Şêr jî Mehmet Bayrak pirtûkê xo, "Klamê şakê kurmançî" de nivisneno ke: "Pr. M.Ragwip" Gazî Mahal' in pirtûkê xo yê ke huna çap nêbiyo de "kataloka kayanê welatî de ornagê înterestî estê." "Nê aredayenan de, parçeyê (klamê) îdeologê şerê Koçgîrî, Alî Şêr o ke tirkî û kurmançî şîran nivisneno, estê". Ew roj verê vîrardena Alî Şêrî de û şehîdanê manê bînan de bi hurmet eme re çok.

Destmala bixwîn

Wekî hemû havînan, îsal jî textê xwe yê ji dara gûzê li ser banî vedabûn. Her êvar dayika Sêvê di gel keça xwe Eysanê hîzarên spî li çar aliyê text dipêçan. Text bû wekî odeyêke bêban. Nivîn li ser text radixistin. Ber êvarê karê hemû keç û jinên navçê ev yek bû.

Xaniyê vê derê bêje hema bi hev ve ne. Jin hem nivînan hildidin jor, hem jî bi hev re gotûgoyan dikin. Carinan jî bûyerên ku ji radyoyê bihistine, bi hev re şîrove dikin.

Êvarî piştî xwarina şivê, cîran diçine şevbuhêrkê. Tina dilê xwe bi çaya qaçax, a binxetê dişikînin. Havîneke bi vî rengî derbas dibe.

Şevêk ji wan şevên germ bû. Bêhiskan (pêşiyar) rûyê zarok û pitikan di-alast. Di dest û rûyê wan de pelqas çêdibû. Zarezara zarok û pitikên lawaz jî ser xaniyan bilind dibû.

Ferzende xwe li ser text dirêj kiribû. Çavên wî ku ber bi peyka başûr ve diçû qerimibûn. Demeke dirêj wilo ma, dawî peyk jî ber çavên wî winda bû. Hinekî li Taxa Hilêlikê nihêrî. Şewqa lembên Qamîşlo jî yên Nisêbinê geştir dixuyan.

Dengê nobedaran jî ji dûr ve dihat, lê nedihat fêmkirin. Ferzende dixwest rojên meha Remezanê, wekî libên tizbiyê li pey hev werin kişandin. Ev salek e ku bi destgirtibû. Par dezgîraneke ne li gorî adedê çêkiribûn. Dê û bavê wî bi wesîqa ku qeymeqam dabû, çûne binxetê, gundê Maşoqê Rihan jê re xwestin. Lê Ferzende ew hew yek carê dîtiye.

Her sal Cejna Remezanê roja duymîn, gelê binxetê û serxetê li ber têlê wekî refên qulingan rêz dibin, bi destûra hikûmeta Tirkî û Sûrî her kes bi mirovê xwe re dipeyive Li hal û rewşa hev dipirsin. Yên serxetê melkes, rûn, nokê dexkirî û hûremûran didin wî alî, yên wî alî jî çay, kitan, qehwe, îskanên çayê yên "qirilmez" didin xwediyê xwe yên ku li serxetê dijîn.

Dema ku pîpîka zabî lê dixê her kes bi dilekî fireh lê şikestî, bi şahiyêke nîvcemayî bi çavên jî hev tîrnebûyî, bi gavên sist jî hev dûr dikeve.

Gelek dotmam û pismam di vê hev-dûdîtîne de dibine destgirtî û gustîlkan bi hev diguhêrin.

Ferzende û dotmama xwe di hev-dûdîtîna (Gorişma) par de hev du dîtibûn.

win, dengê diya wî dihat, digot:

- Behrem di navbera her du cejnan de dawet nabe. Bi xêr piştî Cejna Hacıyan divê ku em bûka xwe biguhêzin. Divê ku tu ji niha de rêberê nas pê bihisînî, da ku Rihanê di tixûb re derbas bike...

Malbata Behrem berî cejnê bi du rojan xaniyê xwe bi kilsê û boyaxê seynandin. Kincên zarokan, şeker, birinc û berxikek jî bo serjêkirinê kirin. Her du rojên cejnê yên pêşî, xew nekete çavên Ferzende. Serê sibehê zû çavên xwe şuştin. Riya xwe kur kir. Kincên xwe wergirtin û riya ber xetê girt.

Zarok di kolanên navçeyê de wekî gulên rengîn bûn. Kincên xwe yên xweşik li xwe kiribûn. Hinek jî wan bi heq li bisiklê siwar dibûn, hinekan dema çavên derewîn di-teqandin, hinek li deydîman siwar dibûn. Ferzende, di ber hola şahiyê ya cejnê de sekinî. Zarokatiya wî hate bîra wî lê zêde nesekîni. Bi lez di ber holê re derbas bû.

Bi rê de leqayî kurê cîranê xwe Behzad bû. Silav dane hev, çûne rûyê hev, cejna hev pîroz kirin. Hêj Fer-

zer hat, wê jî bi megafonê bang kir ku "gorişme" tune ye û bila her kes here mala xwe. Ferman wilo hatiye dayîn. Ev ferman yuzbaşiyê tabûrê daye.

Çawa bang qediya, zabîtek jî panzêrê peya bû, ber bi gel ve hat, jî wan re got:

- Biqêştin herin mala xwe, qey hûn jî xweşikayiyê fêmkirin. Hûn hînî darê zorê bûne. Ku hûn lêdanê nexwin, hedana we nayê.

Dema zabîtek wilo got, xortekî xwe da pêş û got:

- Ev tiştên ku hûn dibêjin ne di cihê xwe de ne. A din jî "gorişme" mafê me ye. Salê carekê em û dost û pismamên xwe hev û din dibînin, nivê malbata me li wir e, nivî li vir e.



Awirên wî ber bi Goristana Cihûyan ve şemitîn. Xwişîn jî Çemê Çexçex dihat. Goristana ku li serê girik e bêhtir nêzîkî malên Serxetê ye. Remiya çiraya ku di goristanê de dixuya carina dikir vemire, carina jî xurt dibû. Bi awayekî sermest li vê çirayê dinerî. Diya wî pîr-sî:

- Lawo Ferzende, tuyê îşev rabî paşivê?

Ferzende rabû rûnişt. Bersiva diya xwe da:

- Yadê, jixwe min dil nîn e ku heta paşivê rakevim. Ezê gaveke din herim qehwê. Nêzîkî paşivê ezê vegerim.

Ewte ewta kûçikan jî ber tixûb dihat.

Dawî destgirtiya wan li binya xetê li mala apê wî Xelef, bi beşdariya çend rîspiyên gund çêbûbû.

Ferzende, heçku li ser êgir be, di cihê xwe de nedisekinî. Li benda roja duymîn a Cejna Remezanê bû. Wê kincên xwe qundereya xwe ya nû wergirta, xelatên ku ji Rihanê re kiribûn, wê tîxista bin çengê xwe û serê sibehê hêj zû, wê cihekî ku li ser pira di ser têlê re ye bigirta. Diviya ku malbatan hinek fersend bidaya wan, ew bi tenê bihiştana.

Dema ku Ferzende jî qehwexanê vegeriya dê, bav, xwişk û çar birayên wî yên jê biçûktir rabûbûn ku paşivê bix-

zende nepirsibû, Behzad got:

- Dibêjin vê cejnê "gorişme" qedexe ye. Yuzbaşiyê nû pir xerab e. Rengê bêbavan pê dikeve.

Mîrov hêdî hêdî ber bi têlê ve diçûn lê leşkeran nedihîşt nêzîkî têlê bibin. Yên binxetê hatibûn ber têlê, qeymeqamê Qamîşlo destûr dabû. Gelê jêr ber xetê kiribû wekî bexçeyekî gulgulî. Hûremûr û xelatê xwe danibûn erdê û li benda xwediyên xwe yên li serxetê bûn.

Xelk li ber devê hepsa navçê ya ku 50-60 metro jî têlê dûr e kom bûbû. Ho-perlorên nav bajêr bang da ku îsal "gorişme" tune ye. Lê kes belav nebû. Pan-

Yê zabîtek ew xort da ber şemaqan, leşkeran jî bi qundaxan êrîşî ser gel kirin. Gel jî bi kevîran li ber xwe da. Vê xirecîrê qederekê dom kir. Dawî bû reqereqa G-3'yan. Çîremir û zakezaka yên derbxwarî bi ser bajêr diket.

Ferzende jî li ber hêtê sînemaya navçê ya havînî dirêjbûyî bû. Xwîn li ber serê wî bûbû gol.

Xelatên ku ji Rihanê re kiribûn di nav xwînê de mabûn. Piştî çend rojan, desmala Ferzende ya ku ji xwînê sorbûyî jî dergistiya wî re şandin, bi rêberê ku wê Rihan serxet bikira re...

HESEN ZINAR

Ji Şêxê Zirav du kasetên balkêş

*Ditirsim ey welat bimrim
nebînim bextiyarî to
Binûsin wa li ser qebrim
welat xemgîn, xemgîn*

Di van rojên rabûrî de ji kasetên kurdî yên ku heta niha derketine cuda, du kasetên ditirên balkêş derketin bazara kurdevariye. Ev her du kasetên ku ji dengê Şêxê Zirav hatine tomarkirin, yek "Mewlûda kurmancî" ya din jî "Beyt û qesîdeyên kurdî" ne.

Xweş tê bîra min, destpêka salên heftêyan bû. Hêj em nû dihatin û di warê jiyana neteweyî de hêj em "sinêla û sava" (nûhatî û xav) bûn. Hest û bîrên neteweyî di dil û mêjiyê me de hîna nû katidan.

Wekî tê zanîn, hetanî destpêka salên heftêyan hunermendiya kurdî ji hemû layan ve hatibû lelekirin, wisa bêxem û bêxwedî mabû di temara xewê de. Tenê di medreseyan ayînî de çand û hunermendiya kurdî li dûv jêhatineke surîştî ji layê mele û feqiyên welatperwer ve di hate parastin û her wisa çand û hunermendî di hundirê xwe de dikeliya û bi livîneke lawaz li ber xwe dida.

Berî derketina hunermendên nûjen ên wekî Aramê Tigran, Seîd Gabarî, Mahmûd Ezîz, Mihemed Şêxo, Şivan Perwer û yên mayî, jarî û belengaziya gelê kurd, êş û daxwazên wan ên neteweyî, bi deng û qesîdeyên van mele û feqiyên welatperwer dihatin ziman. Bi

Beytên Kurdî
Şêxê Zirav

A

- 1 - Min Qabul
- 2 - Ey Felek
- 3 - Bê Qerar im
- 4 - Bedewamin

B

- 1 - Bêmalê
- 2 - Kanê Xelaf
- 3 - Dilber
- 4 - Şermufedî

MEWLÛDA KURMANCÎ
Şêxê Zirav

- 1 - Axaftin
- 2 - Quran-î Kerim
- 3 - Methiye
- 4 - Mewlûd
- 5 - Dua

xwendina helbest û sirûdên Cegerxwîn, Mele Umadedînê Gurdilî û yên mayî, ev mele û feqiyên welatperwer dibûn egerê hişyarbûna gel û bilindbûna hest û bîrên neteweyî û her wisa bi vê tevgera berteng, dibûn pireke polayî di navbera kevn û nû de.

Vêca di van rojên rabûrî de gava ku ev her du kasetên navbirî, berdestî me bûn û min li wan guhdarî kir, ev deng, ev awaz û ev qesîde, bi rastî bi min hîç xerîb nehatin. Ji vî dengê şîrîn û dêrîn, gelê kurd bi biçûk û mezinên xwe ve, li

sirûd û qesîdeyên xweş û neteweyî pir guhdarî kirine. Vî dengê şîrîn û dêrîn, di warê bicihbûna hest û bîrên neteweyî, di nav gel de roleke girîng leyistiye. Belê, ev dengê şîrîn û dêrîn ê ku em jê dibêjin, dengê Şêxê Zirav e.

Her çende der barê jiyana taybet a Şêxê Zirav de min agahiyên berfireh nînin, lê temet ku ez dizanim Şêxê Zirav ji wargehê Xecokê û Siyabendê Silivî ye. Şêxê Zirav kasetek ji Mewlûda kurmancî ya Hesenê Bateyî dagirtiye û di kasetekê de jî, digel du stranên gelêrî; 'Be-

dewê' û 'Felekê xayînê', ji Siyapoş du helbest; 'Min qebûl e xemr û saqî' û 'Ey felek dîsa te kul kir derd û êşanên di min', ji Feqiyê Teyran helbestek; 'Dîsa bixêr bihata bihar', ji Şêx Evdîrehmanê Axtepeyî helbestek; 'Bê hebîb im ez xerîb im', ji Melayê Cizîrî sê helbest; 'Mey nenosî Şêxê Sen'anî xelet', 'Şer-beta lam û beyanê', 'Tebarek sed tebarek', ji Mele Umadedînê Gurdilî du helbest, ji Dilbirîn helbestek û ji Cegerxwîn du helbest; 'Pêjna me kir' û 'Êriş' xwendine.

Ev her du kasetên ku ji dengê dêrînî Şêxê Zirav hatine dagirtin, digel xwendina helbestên ciwan bi awazeke şîrîn jî, lê mixabin ku ji aliyê teknîkî ve lawaziyekê berbiçav heye.

Dibe ku Şêxê Zirav der barê mikrofon û studyoyan de nehatibe perwerdekirin, lê ewên ku Şêxê Zirav bi xwe jî di kasetê Mewlûda kurmancî de navê wan gotiye û ev kaset jî wan re kiriyê diyarî, diviyabû hişyarî arîşeyên teknîkî bibûna. Lê mixabin ku têkilî arîşeyên teknîkî hîç nebûne û van arîşeyên teknîkî tesîreke nebaş li dengê şîrînî Şêxê Zirav û li dêrîniya helbestên kurdî kiriyê.

Digel wisa jî divêt ev kêmasiyên teknîkî tesîrê li Şêxê Zirav nekin û wî ji vî erkê neteweyî yê pîroz dilsar nekin. Bi hêviya derxistina gelek kasetên helbestên klasîkî û serkeftî ji dengê xweş û dêrîn ê Şêxê Zirav.

D.Ş.TIZYANÎ

Rejîma dizek û kontrayî di sekeratê de ye

CELALETTİN YÖYLER



Rejîma xwînmij a nijadperest; bi sedan sal in pencê xwe di kezeba kurdên reben de bi cih kiriye, xwîna wan dirijîne û fir dike. Mînakên vê dirindeya barbarî, bi hezaran in. Yek ji wan mînakên ev e:

Piştî serhildana "Şêx Seîd" ê nemir, li herêma Mûşê, di navçeya Melazgirê, di fermandariya fermandarê bi navê "Dewrêş Beg" de, di yek girekî li gundên derdorên Melazgirê, şanzdeh kurdên gundiyên reben û bêguneh tene kuştin. Yek ji wan kesên kuştî, ji hevalên "Seyîdxan û Alîcan", Hemîd bû. Ew xwînxwar mirovî bi hesinên agirî ser mirovî, lingên wî dax dikin, dişewitînin hetanî dimire. Lê ew kes li ba gelê xwe hê jî sax e, nemiriye. Tirba wî xweşmêrî, li rex çemê gundê Kopala ye û bi navê "Şehîdê Hemîd" ziyaretgeha tawî û bawiyana e. Ev e rewşa barbariya li ser gelê me. Vê barbariyê, ji demên dagirkeriya li ser xaka welatê zarokên kardûxan û medan, hetanî vê demê domandiye. Lê di her demekê de bi dezgehêkî (sîstemekî) hîlbijartî û taybetî hatiye

meşandin.

Demekê zarokên me xistine xwendegehên taybet ên deverî, bi navê (yatılı bölge okulları), ji bona ku wan di nav nîjada xwe de bihelînin (asîmîle bikin), lê bi ser neketine. Demekê jî bi leşkerên taybet (komando), êrîş birine ser gund û bajarên welat, li me xistine, em zêrandine, kuştine û talan kirine. Lê dîsa jî bi ser neketine. Lewre gelê me êdî dinê dîtî û xwendî û zana ye. Dizane ku ev kirinên ne mirovahî her ji bona çavtirsandin û xwekerkirina wan tene kirin. Ji ber van sedeman, dijminahiya dagirkeran a nijadperest, bi gelê kurd ê reben re bûye dijminahiyeke sîstematik. Ango bi her reng û rewşan êrîşên xwe yên tevkujiyên nemirovahî anîne ser kurdên bê çek û destgirêdayî.

Lê gelê kurd ê ku bi sedan sal in hatine perçiqandin û zêrandin û zarokên wan bi dizî û eşkere hatine şewandin û kuştin, ew êdî wekî hirça birîndar û şêrên li daristanan bi kîn û nîfrîn ji xewa koletiyê hişyar bûne û dikine qîrîn û hewar û dibêjin, êdî bes e koledarî. Her mafê ku ji mirovatiya cîhanê û ji we re heye, ew ê me ye jî.

A ji tîrsa van tîrêjên ramanên neteweyên gelê kurd, koledar ketiye nava hej û lerzekî gelekî mezin û şaş bûye. Wekî kesên ku bikevine kûraniya ava deryayê û tede noq bin û derkevin, lê ji bo ku nexeniqin, destên xwe davêjine kefê. Belê bi rastî û zanistî rewşa gelê kurd û koledar wîha ye. Lê ji ber berjew-

endiyên xwe yên mêtîngerî û dagirkerî dest ji xwînrîjandina xwe ya şerê qirêj bernadin û gemariyên kontrayî û çeteyî saz dikin û xwe diavêjin her bextê nijadperestên partiya "Gurê Gewr" û xwefiroşên cahşên kurdan. Ji wan re her tiştên gemar serbest kirine. Ji bona ku ev çepel, her rewşenbîr û welatparêzên kurdan bikujin. Lê Xweda tu dem û gavê "ahê bizina bi qoç ji ya bê qoç re nahêle." Niha em dibînin ku "çeteyên kontrayî" ketine nava hemû saziyên rejîmê û bûne dewleteke serbixwe. Bi rastî çeteyên ku rejîmê bi destê xwe damezrandine, çawa ku xwîna gelê kurd dirijînin, wisa jî êrîş ser her kesê li hemberî xwe dikin û bi kuştinê ditirsînin.

Em dikarin bibêjin rejîmê bi destê xwe agir berdaye mala xwe û gur berdaye koza berxên xwe. A ji ber van rastiyan hanê bûyerên çeteyî, her kesên ku dixwazin kirinên çeteyan bide derxistin û eşkerekirin, ji kuştina xwe ditirsînin û dilerizin. Ji ber van sedeman rejîm bi xwe jî ketiye sekerata mirinê. Eger dixwaze ji vî sekeratê rizgar bibe, li ser wî pir pêwîst e ku dev ji "şerê qirêj" berde û were ser riya rastiya mirovahiya hemdem û bibe alîkarê aştîyê û biratiya li ser himê wekhevîyê. Lê eger vê ramana mirovahî û hemdemî nepejirîne û neyê riya rawestandina rijandina xwîna gelê kurd û ya tirk, ew xwe ji sekerata mirina bi gemarî nikare bide rizgarkirin. Wê di xwîna herikandî û gemarî ya çeteyan de bixeniqe û tune bibe.

Mele tu çi dizanî?

Li Kurdistanê dema feqiyekî medrese biqedanda îcazeta xwe distand û diçû gundên ku mele neçûnê, li wir meletî dikir.

Yekî ciwan ku nû îcazeta xwe standiye berê xwe dide gundekî çiyê, diçe gund. Çend rojan meletiyê dike. Hinekî nimêjê hînî gundiyan dike.

Rojekê dinihêre ku gundiyeke hinekî sergîn xistiye êlika xwe diçe ser goristanê, mele jê dipirse, tê çi bikî ji wan sergînan. Gundî dibêje:

–Ezê bibim ser gora diya xwe pêxim.

Mele:

–Çima çi feydeya wê heye?

Gundî:

–Ji bo ku ezabê wê li dinyaya din hindik bibe.

Mele tê mizgeftê, dest bi wazê dike dibêje:

–Tiştên wiha nebaş in, pêwist e hûn nekin, guneh e. Yekî gundî ji cihê xwe radibe dibêje:

–Mele ka ez ji te pirsekê bikim, ka bêje dema dibe qirçe qirça ezmanan, ji bo çi agir davêje?

Mele dibêje:

–Ma emrê Xwedê ye.

Gundî dibêje:



–Ma wele tu nizanî Îsa û Mihemed li ezmanê şer dikin, ew agir jî ji ber şûrê wan dertê.

Piştî çend rojan mele diçe malekê mêvandariyê. Rûdine, xwarin û vexwarina xwe dixwe, xwediyê malê dibêje:

–Mele ezê ji te pirsekê bikim, ji kerema xwe re bersiva min bi rastî bide. Mele dibêje li ser çavên min:

–Mele kûçikê me mir, me di çermê wê de penîr girt, hela heram e?

Mele dibêje:

–Wele heram e.

Gundî banî jina xwe dike, bi zimanekî şifreyî

–Qizê Gozê şivê bikşîne ji kozê, ez ji mele hildim tozê.

Mele hema ji malê baz dide. Gundî bi pey mele dikeve, pirtûkên wî hildide diqire:

–Wa mele, lo mele te pitpitkên xwe ji bîr kirin?

MELEK BIRÛSK

Ji zargotina kurdan

Çiyayê Sêsalî

Rojekê du heval di rê de diçin. Yek wê derê nas dike, yê din nas nake. Çiyayekî mezin dibinin. Yê ku wan deran nas nake dipirse: “Navê vî çiyayî çi ye?”

“Navê vî çiyayî sêsalî ye”

“Errik! Xwedê emir nedê! Heke sêsalî ew qas bilind be, ewê çar salî çiqas bilind bibe?”

Kurê feqîr

Yekî ji hevalê xwe re got: “Kurekî min heye.”

Hevalê wî got:

“Xwedê jî te re bihêle.”

Ê din got:

“Tu nizanî çiqas feqîr e.” Hevalê got:

“Xwedê bihêle”

Got: “Heke tu çêran jê re bikî, bersiva te nade.”

Hevalê wî got:

“Xwedê jî te re bihêle.”

Disa wî got:

“Heke tu lêxî destê xwe ranake”

Hevalê wî got:

“Xwedê bihêle” Ê din got:

“Kuro mêş xwe datinin ser eniya wî naqewirne”

Hevalê wî got:

“Xwedê jî te re nehêle!!”

Axa û xulam

Axa rojekê nexweş ket, bangî xulamê xwe kir, got: “Here, ji textor re bibêje, axayê min nexweş ketiye.”

Bibêje serê wî werimiye bûye kundir, pozê wî werimiye bûye gêzer, çepilê wî werimiye bûye xiyar, zikê wî werimiye bûye zebes, lingê wî werimiye bûye av.”

Xulam got: “Axa ezê bi kurtî bibêjim zû were axayê min bûye bostan!...”

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (44)

XAÇEPIRSA

Ç	E	L	Î	L	Ê	C	E	L	Î	L
S	E	R	A	D	Ş	Î	N	Î		
B	Û	K	K	E	R	Û	L	A	L	
K	L	Î	R	E	A	S	O			
Y	A	R	E	N	G	Ê	V	E	Z	
R	E	H	R	Ê	Z					
W	B	E	R	A	Z	Î				
B	E	N	A	V	N					
B	A	N	G	E	T	Î				




Bersiva Xaçepirsa 42'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 44'an pirtûka **Firat Cewerî** “KEVOKA SPÎ” ye. **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.




Meqsed Serokê bizavekê (wêne)	Amûreke ronikirinê Henek tinazî	1	Rûbarekî li Qersê	Kesê ji Azerbeycanê	Gihanekek Hêrangeh	Bêhnfirehî tebatî
Piştî				Xêl, xêz		
Ji seri heta bini			Diji şîrin	Çirok (bi zazakî)		Buhîşt
		2			Xwedayek	6
Jimarek			Yekemin	Zulm		
Strasyûm				Kesê ji Italyayê	7	
	Selam, li hev hatin				Gîştî bi erebî	
	Agir				Ahmed.. (şatrek)	
Diji germ	Atmosfer					
	Kesexa daran					
			Xweş, xweşik			5
			Dayîn			
Kesê ji Selanikê	Pari, parçe	4				
						3




Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 42'an, Pirtûka Yaşar Kaya “Gotin” rezen kirine: Nezir Ayan/ Mêrdîn, Zelal Erdoğan/ Mûs. Mehmed Baki/ Bursa, Şahin Sûmbül/ Mêrdîn, Şîrin Bozçalı/ Bartın

PEYVA VEŞARÎ



* Di qezeya susurlukê de dengbîrên sîlahan
hê jî nehate diyarkirin...

HUUSSSS!



Gelek bi zimanê xwe heye

Bi rastî jî di roja me ya îro de ev derfetên ku hatine bidestxistin, tev bi kedê û bi xwîna keç û xortên kurd hatine afirandin. Lê mixabin hin mirov hene ku van derfetan nanirxînin û bi zimanê zikmakî napeyivin.

Ziman navgînek e di navbera du kesan an jî gelan de, pê tecrubeyên xwe ji hev du digirin, xwestek û derdên xwe bi hev du didin fêmkirin; dîsa ziman navgîneke civakî ye. Bi derketina ziman yekîtiya mirovan bêhtir xurt dibe. Ziman, ew deng û peyvên zindî ne, ku pê hev du agahdar dikin. Ziman, ji bo gelan navgîneke wekî nan û avê, bingehîn û pêwîst e. Bi derketina hilberiyê û civakê re ziman jî hêdî hêdî derdikeve holê û xurt dibe. Ew, xwe li ser hilberiyê dide afirandin. Çiqas raman, zanîn û çanda civakê bi pêş bikeve ew qas jî ziman bi pêş dikeve û dewlemend dibe.

Zimanê gelê kurd di Rojhilata Navîn de pêşketî û gelekî dewlemend bû. Ji ber ku dagirkeran bi pergala xwe re, zimanê kurdan lawaz kirin, di şûna zimanê kurdî de jî zimanê xwe li ser gelê kurd kirin ferz. Her çiqas gelê kurd li hemberî zimanê serdestan li ber xwe dabe şexsiyetên mezînan wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî derxistibin holê jî, bandora neyinî ya dagirkeran li ser çand û zimanê kurdî diyar e.

Êrîşê xwînmij û serdestan, li ser gelê kurd roj bi roj zêde dibû. Dagirkeran bi vê nîjadperestiya xwe gelê kurd di qirkirinan re derbas dikir. Komara tirk a faşîst bi qirkirina sor gelê me di xwîne de hişt. Pişt re jî ya spî gelê me da bişaftin.

Lê belê faşîstên tirk çavê wî tîr nebû û dest bi şerê taybet kir. Careke din jî her hêlê ve êrîşî ser gelê me kir. Li her hêlê pergala a (sîstem) xwe da rûniştandin. û çanda xwe ya qîşleyî li tevahî welatê me bi cih kir. Komara tirk dixwest ku gelê me ji rastiya wî dûr bixin û wî bîkî wekî tirkan. Bîdoza kemalîzmê û zimanê jiyana tirkan, bi gelê me bidine pejirandin. Zarokên gelê me bi van bidine perwerdekirin. Lê mixabin, li pir cihan gelê me ji rastiya xwe bi dûr ket. Bi rastî jî hinekên ku digotin em rewşên bir in, pêşengên gel in, wekî mamosteyên zimanê tirkî, zarok û gel hînî tirkî dikirin.

Dagirkerên biyan zimanê xwe bi gelê me şîrî kiribûn û zimanê gelê me jî bi gelê me tal kiribûn. Gelê me roj bi roj bi ber tunebûnê ve diçû, hêvî û baweriya wî jî lawaz dibûn.

Destpêkirina şerê rizgariya neteweyî, ji bo

gelê me bû vejîn, hêvî û baweriyeke mezin. Şoreşa ku dest pê kiriye bi xwe şoreşa ziman e jî. Şoreşa nixrê çandî, wejayî, neteweyî û çînî ye. Gelê me miribû, tevgera azadiyê ew zindî kir. Bêziman bû, ew bi ziman kir. Bê rih bû, ew bi rih kir, ji ber ku şoreşa Kurdistanê; şoreşa vejîna gelê kurd e, di her hêlê de.

Tevgera azadiyê di Kurdistanê de, her tiştî jî nû ve dide avakirin û diafirîne. Artêşa gelê kurd bi livbazî û rêxistina xwe ya şoreşgerî rê li ber ziman û azadiya çanda neteweyî vedike. Mîna ku mirovek çawa bêhnçikiyayî û bêyî avê jiyan nabe, azadiya ziman jî bê şer û rêxistina rizgarî nabe.

Pêşketina ziman bi pêşketina tevgera şoreşgerî ve girêdayî ye. Ger mirov azadî û rizgariya civakê bi rizgarkirina ziman ve girê bide şaş e. Ji ber ku ziman beşek ji jiyana civakê ye. Di vî berî her tiştî civak û xaka nîştîman serbixwe be, da ku mirov bi serbestî roman û fikra xwe bîne ziman. Di roja me ya îroyin de ev gav pêk hatiye û pêk tê. Mîna rojnameya kurdî Azadiya Welat, wekî kovara Rewşen û MED-TV. Her mirovê ku bêje ez kurd im, pêwîst e li ba van hemû saziyan cihê xwe bigire, hem jê re kar bike û hem jî bixwîne û bide xwendin.

Bi rastî jî di roja me ya îro de ev derfetên ku hatine bidestxistin, tev bi kedê û bi xwîna keç û xortên kurd hatine afirandin. Lê mixabin hin mirov hene ku van derfetan nanirxînin û bi zimanê zikmakî napeyivin. Pir mirov hene, bi zimanê xwe nizanin, bi zimanê tirkî dipeyivin û dixwînin. Dewleta tirk heta dawiyê zimanê me qedexe kiriye. Lê belê hêj me dev ji zimanê tirkî bernedaye. Ev yeka hanê bi me dide nasîn ku tiştê biyanan hîn jî bi me şîrî in. Lê ev yeka hanê emê heyatî kengê bidin meşandin? Îro em dibin xwedî dewlet, lê hîn jî pir kes ji vî yekê bi dûr in.

Ew mirovê ku dibêje ez kurd im, divê cihê xwe di nav gelê xwe de bigire: Ev derfetên pêwîst e ku ji bo yekbûna gel, xurtkirina hezîkirina ji şoreşê û alîkariya nav di kurdan de were bi kar anîn. Ji ber kurdayetî vî yekê dixwaze.

RIYAT AHMET HASAN

Ji germbûna Efrînê ta Parîsa sar

Destpêk Rûpel 16

Jînenîgariya Inayat Attar:

Inayat Attar di sala 1948'an de li li gundê Birincê ku li ser Efrînê ye hatiye dinyayê.

Ew endamê Sendikaya Hunerên Ciwan a li Sûriyeyê ye, her wiha endamê Yekîtiya Nîgarkêşên Erebb û endamê Komeleya "Spadem" a li Fransayê ye.

Pêşangehên wî yê şexsî

- Al Reqa, Sûriye, 1981
- Sed Al-Firat, Sûriye, 1982
- Heskê, Sûriye, 1983
- Navenda Çanda Rûsî, Şam, 1986
- Muzeya Helebê, 1986
- Lazqiya, 1987
- Salona Hunerê Ciwan, Humis, 1988
- Salona Cewşen, Heleb, 1991
- Fransa, Lille, 1992
- Salona Sîmad, Parîs, 1994
- Salona Opera Massy, Fransa, 1994
- Angers, (Fransa), 1994-1995

Festîval û pêşangehên bi tevahî li Fransayê:

- Bi navê "Huner, Çandeke Hemerenge" li Etampesê, 1993
- Bi navê "Pira keştî" (Yekemîn Festîvaleke Çandî ya Navneteweyî), 1994
- Pêşangeha Salane ya li Bagugetê, 1994
- Li Choletê, 1994
- Pêşangeha navneteweyî, li Francon Villeyê, 1994
- 49 Nêrîn, 1994
- Salona Doutreyê li Angersê, 1995
- Expo -95 li Salut matainê, (wek mêvanê şanaziyê), 1995
- Wergera ji erebî: FENER ROJBIYANÎ

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMİSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewropayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yüsv
963-21-960099

Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçük
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Ji germbûna Efrînê ta Parîsa sar



NÎHAD GULÊ

Inayat, hunermendekî kurd e, kete evîna şîne zeytûnê, ta ku dilê wî pê tijî bû; kete evîna roja Efrînê ta ku çavên wî tijî ronî bûn. Inayat navekî bilind e di tevgera hunera ciwan a kurdî de. Bi şeweya wî, rengên kurdî yên keskesor, hebûna xwe ya cihêreng di cihana tabloyên taybet de çespandin, kesh li ba wî ji bêhna "Zaaterên çiya"* û şîna zeytûnê têr bûye.

Sor her dem geş û germ e. Mîna germahiya gungulilk, rengên dewlemend, bêhna welat, giyana folklor û çand û pêmahiyê, jê dertê.

Inayat hunermendek e, bi firçeya xwe dipeyive, başî û nebaşiyê tîne ziman, vî zimanê şîrîn werdigerîne tabloyan, tevî rengên xeftana keçeke kurd.

Bi şeweyekî "realîzm"ê tevî hesteke "abstraction" a hemdem û di hundirê nûjeniyêke hunerî de, tevî hesteke nerm û tenik, ji êşkêşan û xemxariyêke rojane dertê.


Ew hest û axîn û keserên xwe bi germahiyeke hêmin li ser cawekî spî belav dike û caw jî ji temaşevanan re dipeyive û çîroka Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Cembeliyê Mîrî Hekarî dibêje.

Inayat her tiştê li derdora xwe dişikîne û ji nû ve ava dike. Lê bi şeweyekî hunerî, nûjen û bi rengên ji şîna tawûsan û hilm û bêhna axa piştî baranê, tijî ne.

Inayat zarokekî mezin e. Ew baş dizane çawa bi tîrêjên ronahiyê bigire... Xwedî giyaneke dewlemend e. Qet westabûnê nizane. Ew "Zorba Yûnanî" tîne bîra mirov, ne xasma gava dest bi awaz û narînen çiyayî dike. Rexnegirê fransî "Jack Piere" li ser wî nivîsand û wiha got:

"Inayat hunermendek e, bi dilgermî rêça xwe ya dirêj dişopîne, ew rêç a ku ji sîdaran û rengên keskesor e, bi şeweyekî nazik pêk tê. Ji mirov re tê xuyan ku ewqas xwedî xeyaleke xurt û tenik e, tevî rehên dirêj di kuraniyê de ji me re helbesteke evînî, rûdanî û efsanewî di demekê de dinivîsîne.

Inayat bi zaravayekî taybet, navgînî û peywendiyê



Tabloya bi navê Dîwar a ku mijara wê li ser Siyabend û Xecê ye

bi cihana hawirdora xwe re datîne, Bi wî zimanê nazik û tenik ê ku jê re dibêjin "hunerê ciwan". Bi vê mebestê Inayat dibêje: "Dema ku ez bixwazim nişanên xwe ji bo navgînî û tîkiliya bi kesên din re bavêjim, ne xem e, ger wêne be, deng be, yan peyv be. Di wê dema ku ez karê nigarkêşiyê dikim de, dikarim bibêjim ez însan im."

Inayat bi yekcarî naxwaze ku berhemên wî bi çend peyv û gotinan bêne wergerandin. Ji ber ku wergerandin di nêrîna wî de ji nîrxên karên hunerî kêmtir dike. Lewre jî ew dibêje: "Ji min nayê xwestin ku ez berhemên xwe wergerînim, ez tiştê li ba min e dibêjim, tiştê di dilê min de ye ez dikim, mîna hunermendekî, erkên xwe pêk tînim."

Hunermend Inayat, li ser girîngiya huner û pêwistiya wê, navgînî û pêwendiya di nav gelan de tîne ziman. Inayat, ketîna huner di hemû warên jiyane, avakirina şaristaniya mirovahiyê û pêsketina mirovan de û li ser rol û bandora wê wiha dibêje: "Eger ne huner bûya cihan nedikarî bigihîşt a ciwanî û bedewbûna cilçêkerê fransî Piere Cardin."

Lawê Kurdistanê hunermend Inayat, cih û hebûna xwe ya balkêş di tevgera hunerên ciwan ên Sûriyeyê da xuyan.

Li ser kar û berhemên wî, ji mezintirîn, rojname û kovar, hunermend û rexnegiran nivîsandin. Mîna; Dr. Fatih Al Muderis, rexnegirê kurd Selahadîn Muhe-med, Dr. Mahmûd Şahîn.

Em dikarin bibêjin ku Attar di gel Omer Hemdî, Beşar Îsa, B. Haco û yên din, çarçoveya tabloya hunerên ciwan li Kurdistana Sûriyê pêk tînin, eger ne li tevahiya Kurdistanê be.

Hunermend Inayat Attar ji sala 1992 û vir ve li



Tabloya bi navê Xwaringeha Kurdi

Fransayê dijî. Têbînî: * Zaaterê çiya, giyayek keske ku, di despêka biharê de tul dide, biçûk û li ser gir û çiyayên welêt dertê. Xwediyê bêhneke xweş û cihêreng e. Tê xwarin bi tenê yan tevî zeytûnê.